kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎN/2009



42

www.arsivakurdi.org

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 42 havîn 2009
Ansvarig utgivare
Ali Çiftçi

Redaksiyon
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post
info@birnebun.com

Internet
www.birnebun.com

Têkilî/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin / Dağıtım
Ewrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı
Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Pîrejina kurda ji Ermenistanê (1985) Ji arşiva Tosinê Reşid

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwediyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivekurd.org

NAVEROK / İÇİNDEKİLER



2 "Pirsa Kurd" Ali Ciftci

4 ``Doza Kurd`` û Pêvajoya Nû, Nebî Kesen

10 Şênayîya Xelîka ên jor a dostanî û aşitîyê, Mem Xelîkan

12 Kurdên Yekîtîya Sovyetê: Berê û niha, Tosinê Reşîd

32 Dayêka Delal, Mem Xelêkan

44 Li Berlînê Kurdê bi navê Riza Baran nîşana rûmetê sitand! , A Balî

50 Kurd û pirsa zimanê standard, Mueyed Tayîb

54 Li ser koka mîren Ezîzan û Diyadîn- li Bedlîsê, Jordan

59 Kilameka şînê li ser Xeloyê Delşi Pepê, Nuh Atêş

63 *Mîrîmîran Alîşan Beyin Mezarı, Dr Mikaîlî*

65 Çûka Berbangê, Xizan Şîlan

67 Parcenivis

68 Hevala bûkê, Memê Hilkeçikî

72 Îsal temel tam tune bu! Ayşegul Kisabacak

87 *Mahmutlu Köyü Anatomisi Üzerinden Sexbilan Aşireti Tarihi - II, Vahîd Duran*

İki Yeni Kitap, Bir Şair, Gülay Mermer

www.arsivakurdi.org

"Pirsa Kurd"

Piştî damezrandina Komara Tirkîyê, ev 86 sal in, yekem car e, "Pirsa Kurd" ketiye rojevê. Ev ji rêvekirina diyalogê re gaveka erênîyê ye. Ji ber ku di dîroka gelê kurd de herî pir, bi sîstematîk û bi polîtîkayeka nîjatperestiya tirkîtîyê, di aliyê kesayetiyê de, li bakûrê welêt, kurd hatine pelçiqandin. Herçiqas li ser pelçiqandina kurdan li Tirkiyê, ji ber sebebên siyasî, dîplomatîk û konjuktura dinyayê, lêkolînên berfireh nehatibin kirin jî, kurd li Tirkiyê di vî warî de hatine qetilkirin. Jenosîdên sedsala dawî ku li dinyayê bûne, yek ji wan jî ev politîkaya Komara Tirkêyê ye. Dê wext bê, Komara Tirkîyê dê hesabê vê politîkaya xwe bide.

Bi politîkayeka herî hovane, 86 sal in, xwestin kurdan li beşa Tirkîye, ji ortê rakin, lê ji ber berxwedan, têkoşîneka bê westan û ya herî giring jî xwedîbûna kewneşopîyeka dewlemend a kurdan ev politîka hovane ya înkariyê nikaribû bi serkeve.

Di van 30 salên dawî de mezintirîn serêşiya Komara Tirkîyê "Pirsa Kurd" bû. Kurd, cî û warên xwe bi dûr ketin, hatin kuştin û pênaber bûn.

Bi vê êş û wêraniyê re jî kurd bi xwe hesiyan û polîtîze bûn. Gundiyên xizan li ser erdê xwe bi darê zorê hatin qewitandin. Ji wan gundiyên xizan bi sed hezaran hem li bajarên Tirkiyê yên mezin, li metrepolan û hem jî li welatên Ewropayê bûn pênaber.

Di jiyana pênaberiyê de jî, ji çand û zimanê xwe gelek pîroziyên xwe winda kirin!

Dema em ji nîmetên vê sedsala dawî ku ji aliyê zanistiya teknîkî û ragihandinê ya li dinyayê temaşe dikin, em dibînin ku xelkên din çiqas feydê jê dîtine û însanên xwe çawa pêşketine. Kurd jî hê ji bo hebûna xwe ispat bikin, bi salan e têdikoşîn. Ji ber kesayetiya xwe têne kuştin.

Aniha pîştî ku êdî baş hat xuyakirin ku bi vê polîtîkaya nîjadperest û înkariyê dê nikaribin berdewam bin, hinek deng û dîtinên nû ji alî hukumetê ve têne rojevê. Helbet ev ji bo kurdan destpêkeka pozîtîv e. Dîvê ji van dîtin û gavên ku têne avêtin, an dixwezin bên avêtin re alîyên kurdan jî pozîtîv bin ku hê baş rê jê re bê vekirin.

Niha, bi lez û bez tu dinêrî hinek anket li Tirkiyê têne kirin. Di van anketana de dixwezin kurda îkna bikin ku tirk û kurd çiqas bi hev re wek "***bira***" bûne û ketine nav hev û nikarin ji hev cûda bibin!

Di masmediya tirkan de jî xirecirekê dest pê kiriye. Dîtinên cuda têne rojevê. Ew "aqilmendên" wan ku di rojname û debatên siyasetê de heta niha ji bo înkariya kurdan teorî îcad dikirin, tu dibînî weke ku heta niha qet gunehkariyek nekiribin, bûne xwedî "Pirsa Kurd".

Lê dema em bi kûrî li dîtin nêrînên wan ên li ser "Pirsa Kurd" dinêrin, em dibînin; dîsan xapandin, lîstik û dekûdolabên berê hene. Dixwezin doza kurdan bikin meseleyeka kesayetiya şexsî!

www.arsivakurdi.org

Divê em wek her ferdekî kurd û hem jî wek rêxistin û partiyên siyasî, di daxwez û dîtinên xwe de pir vekirî û xwedî daxwezin mezin bin.

Îro li Tirkîyê tirkek çiqas bi tirkbûna xwe, bi ziman û çanda xwe, bi reng warê xwe serbilind be, heqê her kurdekî jî heye ku bi zimanê xwe bi reng û navê xwe serbilind û xwedî dewlet be! Kurd divê ji bo navê warê xwe û rengên xwe û ziman û çanda xwe, bê tirs, wek ji bo tirkekê ev mafên netevî çiqas pîroz bin û bi rîya destûrî hatibin parastin, divê bo kurdekî jî ew mafên bingehîn bên parastin û pîroz bin.

Erê, dîsan di vê hejmarê de birêz Nebî Kesen bi sernivisa *"Doza Kurd" û Pêvajoya Nû* dîtinên xwe yên li ser "Piras Kurd" li Tirkiyê şoreve dike. Birêz Mem Xelîkan li ser festivala Xelikên Qerecdaxê ya *dostanî û aşitiyê* nivisiye û bi wêneyên ji festîvalî xemilandiye. Altun Başaranê bi sernivîsa *Şayiya kovara Bîrnebûnê li Stockholmê* agahdariya şevê dide.

Tosinê Reşid navekî naskirî yî ji kurdên Ermenîstanê ye. Di vê hejmarê de bi ser nivîsa *Kurdên Yekîtîya Sovyetê: Berê û niha* lêkolîneka bi detay nivisîye. Kurdên wê derê bi me dide nasandin û li ser jîyana wan ya berî hilweşandina Sovyetê û piştî hilweşanê lêkoliye.

Birêz A. Balî bi sernivîsa *Li Berlînê Kurdê bi navê Riza Baran nîşana rûmetê sitand!* xeberê xelatgirtina birêz Riza Baran nivisiye. Birêz Riza Baran bi xwe ji bajarê Kirsehîrê, li gundê Tavira ye. Ji 1963an vir ve ye, li Almanyayê dimîne. Bi salan, li Almayayê di sendika û meclisê da kar kiriye. Hem di nav civata almanan de û hem jî li nav civata kurdên li Almnayayê de xebatên civakî û siyasî de cih girtîye.

Seyfî Dogan bi navê *pezbir* kurteniviîsek li ser jîyana li gundê Qerecdaxê wek bîranînekê, bi zaravê xelika nivisîye. Birêz S. Dogan herwiha bi navê *Deştê Lykaonia herema Axylonê û gundê Drya* hem li ser festivala Xalikên jor agahdarî dide û hem jî festivalê şirove dike.

Birêz Mueyed Tayip bi navê *Kurd û pirsa zimanê standard* nivisek li malpera *kulturname*yê de belav kitibû. Ji ber aktualîteya mijarê me ew nivîsa carek din bo we xwendevanên birêz, di vê hejmarê de weşand.

Birêz Nuh Atêş kilameka şînê ya li ser Xeloyê Delşi Pepê berhev kiriye. bi kurtî li ser wî agahdariyek nivisiye.

Xizan Şilan îcar jî bi navê *Çûka Berbangê* kurteçirokek li edebiyata me zêde kiriye.

Amed Tîgrîs *di kurdî de navên mehan*, Nurettin Kilic û Cengîz Demir, *li ser gundê Qişlê*, Dr Mîkaîlî *Mîrîmîran Alişan Beyin Mezarı*, Vahîd Duran *Mahmutlu Köyü Anatomisi Üzerinden Sexbilan Aşireti Tarihi - II,* Ayşegul Kisabacak li ser tatila xwe ya îsal îronîyeka balkêş bi navê *Îsal temel tam tune bu!* nivisîne.

Gülay Mermer yekem car e, bo kovara me bi sernivîsa *İki Kitab Bir Şair* bi zimanê tirkî li ser du berhemên nû yên Şaîr Ö. Faruk Hatipoğlu nivisiye. Em li vir jê ra dibên; tu bi xêr hatî!

Heta hejmara bê her dilşad û bextewar bin!

Ali Çiftçi

www.arsiyakurdi.org

``Doza Kurd`` û Pêvajoya Nû

Nebî Kesen

Pirsgirêka Kurd li Tirkîyê ket pêvajoyeke nû. Serokê PKKê, Abdullah Ocalan bi îlankirina proja bo aştî û çareserbûnê niqaşek li Tirkîyê vekir. Tesîra vê, li ser raya gîştî û medyaya kurdan û ya tîrkan, bi gavek hikûmeta AKPê hîn jî xurtir bû. Hikûmetê eşkere kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd projeyekê bê amadekirin. Bona vê, wezîrê karê hindur Beşîr Atalay bi hemû hêzên sîyaset û civakê re civînan çêdikê û pêşnîyazên wan guhdar dikêe

Pêşnîyaz û daxwazên Ocalan û PKKê heta niha bi piranî hatine ziman û tên zanîn. Ji van hinek ev in: qebûlkirina fermî ya nasnameya kurd, mafên çandî û xweîdarekirina herêman ji bo kurdan, şertên û azadîyên xebatên sîyasî yên PKKê û partîyên kurd yên din, efek bo gerîlayên PKKê û destberdena şerê çekdarî. Ew daxwaz ji alîyê kurdên der PKKê jî tên qebûl û deng kirin. Ditînên cuda di nav kurdan da timûtim û niha jî hene, lê ew li ser çareserkirina pirsgirêka kurd bi temamî ne.

Hikûmeta AKPê bi sernameya ``Projeya Kurd`` eşkere kir ku, ji alîyê dewletê jî daxwaza çareserkirinê heye. Di vî warî da konsensûsek di ``qatê jor`` ya dewletê de pêkhatîye. Serokdewlet Abdullah Gul berî çend mehan va rastîya hinek caran anî ziman. Piştra serokwezir Recep Tayyîp Erdogan û wezîrê karê hindur Atalay ji raya gîştî re dan zanîn ku pirsgrêka kurd ê bi gavên sîyasî bê çareserkirin. Ev plan û armanca hikûmeta AKPê ji alîyê leşkeran ve jî hatîye qebûl kirin.

Naveroka projeya AKPê hîn nayê zanîn. Li ser ``usûl`` (metod), wezîrê karê hundir Atalay hinek tişt gotin. Gora vê, hikûmet dixwaze ku bi partîyên sîyasî, rexistînên civakî yên sîvîl û pisporan re têkilîyan dayîne û guhdarî, li daxwaz û pêşnîyazên wan bike. Dawîya wê divê hikûmet ``paketa çareserkirinê`` bike û bide nişan kirin.

Erdogan û çend wezîrên wî ji niha da behsa ``xetên sor`` yên dewlet dikin. Ji van yek li ser dersê zimanê zikmakî ye ku, divê kurdî di dibistanan de wek zimanî fermî û perwerdeyê nebe. ``Xetek sor`` ya din li ser nasnameya netewî ya kurdan e. Gora dîtina hikûmetê, nasnameya kurd nikare di qanûna bingehî (anayasa) da cîh bigre. Planeke hikûmeta AKPê ew e ku tarîfa nasnameya netewî ya qanûna bingehî (made 66) bê guhertin.

Çarçewe ya ``guhartinên`` hikûmetê bi giranî divên ev bin: mafên çandî yên şexisan, vekirina fakulteyên Kurdolojî li zaningehan, qebûlkirina guhertînên navên gund û bajaran. Eşkere dibe ku ``Doza Kurd`` ne nêzikî daxwazên kurdan e. Hikûmet

www.arsivakurdi.org



Festîvala Golyaziyê ya çandî û piştgiriyê, 2009

Wêne ji malpera www.gölyazi.bel.tr hayti ergirtin.

ji bo qebûlkirina nasnameya netewa ya kurd û mafên çarenûsî ne amade ye. Dîsa jî partîyên netewîst û nijadperest wek MHP û CHP li dijî projeya AKPê ne.

Tenê DTP gavên hikûmetê girîng, lê ne bes dibine. Serokê DTPê Ahmet Turk hevdîtinek bi Erdogan re çêkir û helwesta partîya xwe anî ziman. Dîtinên herdu teref ji alîyê aştî û çareserkirineke sîyasî wekhev in. Di navbena hikûmeta AKPê û DTPê da li ser rola Ocalan û PKKê cudatîyek heye ku ew ji bo hevkarîye astengeke mezin e. Ji bona vê, niha AKP bi projeya `` Kurd`` di nav partîyên parlamentoyê da bi tenê ye.

Tevgera kurd jî li ser herdu projeyan, ku naveroka van hîn ne eşkere bûye, niqaşan dike. Di vir de dîtin û pêşnîyazên cuda carek din xuya dibin. Argûmanên van helwestan jî, him ji hev dûr in û him jî bi navekokîyan re girêdayî ne. Du sedemên wê, parçebûna tevgera kurd û kêmasîya tûnebûna otorîteyeke netewî ne. Daxwaz û pêşnîyazên PKKê û DTPê ji alîyê hemû hêzên kurdan ve nayên qebul kirin. Loma, di vê pêvajoyê de kurd tiştên ji hev cuda tînên ziman û ev jî roleke negatîv dilîze.

Wek tê zanîn, jî alîyê DTPê ``Kongreya Civata Demokratîk`` pêk hat. Hewldana DTPê li ser beşdarbûna hemû hêzên kurd yên xebatên legal dikin, bû. Berpirsên DTPê dizanin ku bê yekitîya kurdan quweta wan tenê têrê nake. Lê, hinek grûbên kurd wek HAK-PAR û KADEP ji van Kongreyên DTPê dûr sekinîn. Divê Tevgera Kurd xwedî programeke netewî be û bi yek deng daxwazên kurdan bîne zimên. Wê demê hikûmeta AKPê û dewleta Tirk jî yê bizanin ku daxwazên kurdan yên zelal kîjan in.

Pirdengî di nav kurdan de gelek şaşîtiyan jî derdixe holê. Kesên ku qet tu caran di tevgera kurd cîh negirtine, derdikevin medya Tirkîyê û bi navê kurdan diaxifin. Mafên van kesan wisa tune ye û divê dewlet guhdarîya wan neke. Çima ku şexisên dûr

www.arsivakurdi.org

tevgera kurd tucar kurdan temsîl nakin û nikarin daxwazên netewî bînin ziman.

Hinek nivîskarên kurdjî wek temsîldarên kurdan peşnîyazên xwe pêşkeş dikin. Ev jî ne rast e û ne baş e. Muhetebbûna kurdan divê di bin şemsîye ya tevgera kurd, ku PKKê hêza herî mezin e, da pêkbê. Dewlet jî otorîteyekê wisa bizane û qebûl bike. Belê, şexis dîtin û peşnîyazên xwe dikarin bêjin, lê nikarin wek ``programa netewî`` pêşkeş bikin. Ev ne etîk e û zerareke mezin dide tevgera kurd.

Şaşîtiya hinek kurdan ew e ku ji niha de bi AKPê û hikûmetê bawerîyek pêkbînin. Ji bo bawerî û piştgirî, hîn tu xebatên hikûmeta AKPê û dewletê tunen. Gelo çawa kurd ewqas zû pesantina AKPê bikin? Ne naveroka ``Projeya Kurd`` tê zanîn, ne jî dewletê sîyaseta xwe ya kurd guhertîye.

Ocalan bi wesiteya parêzerên xwe ji raya gişt î ya kurd re eşkere kir kune ew ne jî PKKê bi tenê daxwazên hemû kurdan dikarin tespît bikin. Bona vê peşnîyazek li ser komkirina dîtinên kurdên din jî kirîbû û parêzeran gelek peşnîyaz li Kurdistan, Tirkîyê û Ewrûpa berhev kirin. Çiqas van peşnîyazan li ser amadekirina projeya Ocalan kir, nikar bê zanîn. Lê, ev metod di cîh da ye. Mixabin partî û rêxistinên kurdan bi temamî peşnîyaza Ocalan nedan berçavan. Hêzên kurd ên li derveyî PKKê jî divê ditîn û rexneyên xwe bînin ziman. Bi vê şikle mimkûn e ku daxwazên netewî derkevin holê û hemû kurd wek konsensûsek qebûl bikin.

Rêya çareserkirina pirsgirêka Kurd çi dibe bila bibe, mafên kurdan ên netewî hene ku ev nabin babeta tawîzan yan jî konsesûsek bi Tirkîyê re. Ji van hinek ew in:

- Kurd netewek in û welatê wan Kurdistan e.
- Nasnameya netewî ya kurdan bi awayekî fermî bê qebûlkirin.
- Mafên çandî yên grûb ji bo kurdan di qanûnan de cîh bigrin.
- Herêmên Kurdistanê (û yên Tirkîyê din jî) dîvê xwe bi xwe îdara xwe bikin. Otonomî û federalîzm du şîklên wê ne.
- Demokrasîyeke ewropî li Tirkîyê pêwist e û divê pêk bê.

Mimkûne ku qebûlkirina van û daxwazên din demek dûr û dîrêj bajo. Lê, ev naye wê manayê ku kurd van tiştan nebêjin. Ji alîyê din ve daxwazên minak DTPê ji bo pêvajoya pêş me jî pêwist in. Konsensûseke kurdan û dewletê li ser daxwazên kurdan yên asgarî, rê li ber çareserkirina pirsgirêka kurd ebedî ku dewletbûn jî têda ye, vedike. Bi vê manayê armancên nêzik û dûr bi hev ve girêdayî ne û di pêvajoyê de hevdu temam dikin. Pirsa giran ew e ku kurd çawa îro gavên çareserkirinê tespît bikin û bidin qebûlkirin.

www.arsivakurdi.org

Şayiya kovara Bîrnebûnê li Stockholmê

Di 23ê gulanê de li Handena Stockholmê, li restauranga Parabolê me disa bi coşeka xweş şayiya Bîrnebûnê pîroz kir. Nêzî 250 kurdên Anatoliya Navîn beşdarî şayîyê bûn.

Di şayiyê de li gel xwarin û vexwarinê, Koma Anatoliya Navîn, Koma Qerejdaxê, dengbêj Salih Delen, dengbêj Gursel Qemerî û dengbêj Yaşar bi stran, deng û muzika xwe şev geş kirin. Şayiyê heta 02.00-ê şevê dom kir. Weke dengbêjên mêvan Sîdar û Mehmed Kaya jî bi dengên xwe ên xweş şeva Bîrnebûnê geştir û govend germtir kirin.



Altun Başaran

Dengbêjan bi deng û awazên xwe em birin heta erda goçbera sedsalan ku ew çawa ji welatê xwe ji gund û bajarên xwe bi derketin gereka dûr û dirêj... Gerek ji mecbûrîyê gerek ji zarûriyê, bi malbatên xwe; bi zar, kal, pîr pezi û terekê xwe ve dan du xwe, ketin dora rê. Rêka dûra û dirêj a bê cî û bê ar!.. Bi mehan li rê bûn, bê av man, birçî man, xasî û tazî man, stuyê xwe dirêjkirin hetanî Anatoliya Navîn. Bi konên xwe yên reş, li dor pêy Ankarê evirin. Pişta xwe didan çiya, çiya ji xwe ra dikirin star. Dûra hetanî Konyê û Kirşehîrê belav bûn. Îro ji wan konana her konek bûye gundekî. Li her gundekî bi hezaran malbat çêbune. Îro tekrîben li der û dor Ankarê 95 gund, li Konyayê 75 gund, li Kirşehrê 40 gund hene. Heta wan salên dawî xwe bi rêçberîyê, çotkarîyê xwedî kirine. Ji salên 1960î vir ve dîsan dest bi goçberiyê kirine. Wekî berî 500 salî ber vê, çawa ji Kurdistanê ber bi rojavayê bi rê



Gursel Qemerî û Cengîz Acar

www.arsivakurd.org



Dîmenek ji şevê

ketine, çawa diyar bi diyar xwe dane erdê û lê cîwar bûne, çawa gund bi gund li xwe kêm kirine û gelek hindik mane, yên ku ji ber wê koçberiya Anatoliya Navîn mane, gelek ji wan jî îro li Ewrûpayê belav bûne. Goçberî bûye qedera me. Lê ew çûne kuderê, ne zimanê xwe û ne kultura xwe, ne jî cil bergên xwe ji bîr nekirine!

Berpirsê kovara Bîrnebûnê Alî Çiftçî xêrhatina mêvana kir û di gotara xwe de li ser giringîya kovarê û zimanê wê, wiha got: Heta ku ji destê me tê em dixwezin Bîrnebûn bi zimanê kurdî be, lê hin nivîsên girîng ku pêwendiya xwe bi kurdan re û nemaze bi kurdên Anatoliya Navîn re heye, em wan jî bi tirkî diweşînin. Lê ferqeke berbiçav jî derketiye holê ku niviskarên me êdî giraniya xwe didine ser zimanê kurdî…



Salih Delen



Koma Qerejdaxê

Ji nivîskarên kovara Bîrnebûnê Nuh Ateş jî axaftinek li ser girîngîya hebûna Bîrnebûnê kir û got: ” Kovara Bîrnebûnê

www.arsivakurdi.org



bo me kurdên Anatoliyê wek kovara Hawerê ye, ku ji aliyê Kamûran Bedirxan ve di surguniyê de derketibû."

Ji nivîskarên Bîrnebûnê, Nebî Kesen ji bo wergirtina diktora xwe ya li ser fîlozofiyê û Hatîce Polat jî ji bo pirtûka xwe ya bi navê -*Gotinên min yê pêşiyê / Ferhenga Piçûkan* hatin pîrozkirin.

Di şeva şayiya de dîsan weki malbat ji Almanyayê, Îsvîçrê, Holandê, Danîmerkê, Norweçê kurdên me li hev civîyan, wekî xwîşk û bira bi hev xenî bûn.



Yaşar



Sîdar

Ji bilî dengbêj, nivîskar û xelkên ji kurdên Anatoliya Navîn mêvanên ji deverên din jî beşdarî evê şayiyê bûn. Weke saziyên kurd Federasyona komeleyên kurd li Swêdê û weke sîyasî jî PSK bi nûnerên xwe pîrozbahî li hebûna kovara Bîrnebûnê kirin. Bi mesajên xwe hêviya berdewamiya kovarê daxwaz kirin.

www.arsivakurd.org

ŞÊNAYÎ YA XELÎKAN ÊN JOR YA DOSTANÎ Û AŞTÎYÊ PÊK HAT

MEM XELÎKAN

Şênayi, bi dest xortên Xelikan û bi alîkarîya beledîyê (Şaredarî) hat amede kirin. Şênayî yê ji alî gund û qesebayên doralî Xelîkan û gelên Xelîkan ve eleqeke mezîn dît. Şênayîya ku serokên beledîyên heremê beşdar bûn û ji gund û beledîyên doralî ve gel û xort tev lê bûn bi coş û hêcaneke mezîn dest pê kir.

Şênayîya bi organizeyeneke mezin hat amede kirin; bi dengkirîna serokê komitê ,Erdem Öztek û serokê şaredariya Xelîkan Şahin Ateş li seet duwanzdehan (12-00) dest pê kir.

Ji redaksiyona Kovara Kurdên Anatolîya Navîn Bîrnebûnê Nuh Ateş, ji Xelîkan endamê meclîsa Stockholmê ya heremî Seyfî Doğan, Av. Yusuf Çakmak û ji Xelîkan endamê bajarê Enqerê-Çankaya yê CHP ji meclîsa gîştî Yusuf Gündoğdu jî mêvan bûn.

Îsal, şênayîya Xelîkan mîna salên çûyî ne li navenda gund, li derî gund li sahe ya futbolê (sahaya goga lingan) pêk hat, pir jî baş bû. Li wê meydana mezin, hevalan ji bo temaşevan û mêvan rehet bikin kon vegirtîbûn. Ferahîya meydanê, him keç û xortên govend dikişandî, him hunermend him jî mêvan pir rehet kirin.

Her wext derbas dibû keç û xortên Xelîkan û mîvanên beşdar bi sitranên hunermendan û bi dahol û zirnê li her alîyekî



Xortên Xelikan di destên hev de bazin girêdane û govendeke germ digerîne.

www.arsivakurdi.org



Keçên Xelikan didin xuyakirin ku bêyî dawet û nîşan jî meriv dikane şayiyê bikin û bireqisin.

meydanê govend dikişandin. Şênayî bi coş û hêcaneke mezîn rengînî kirin.

Koma Avaz, Koma Serhat, Koma Xelîkan, Kemalê Amed, Serbilind Kanat, Ehmedê Serhad, Murat Küçük Avcı, Murat Özmen hunermend û komên Şênayîyê bûn. Wan Kom û Hunermendana bi sitranên xwe pir coş û hêcan tev li şênayîyê kirin. Xort û keçên Xelîkan û mêvanên beşdar, bi govendân dilşad, mêvan kefxaş kirin û şênayî bi rengînî, bi coş û hêcaneke mezin berdevam kirin. Ji Xelikan Dengên Amator: Bilal Çiftçi, Ehsan Xelîkan, Miherem Xelîkan bi sitranên folklorîk hê coşeke mezin tev li şênayîyê kirin.

Ji Partîyên Tirkîyê yên di Meclîsê de(DTP , CHP û AKP) wekîlên herêma me (li herema me wekîlên DTP tunen) Hatibûn dawet kirin. Lê mixabin; Kesek ji wana beşdarî şênayîyê nebûn. Tu berdevk û mesaj jî, ji şênayîyê re neşandin.

Pêşkeşvanên Şênahîyê, bi helbestên, helbestvanên heremê: Yên Xizan Şîlan, Mehmet Ercan, Mem Xelîkan, Ö.Faruk Hatipoğlu, Mustafa Kızılkaya, Dilşad Nûdem, Ferîdûn... hwd.Şênayî dewlemend kirin.

Di Şênayîyî de rindi û çelengîyeke din jî; ji Xelîkan wênevan Filiz Ateş û çend hevalên wê bi navê "Hunera desta ya heremê û sifet" pêşangehekê vekirîn. Ew pêşangeh hemû mêvan û beşdarên şênayîyê dilşad û kêfxwaş kirin.

Li dawîya Şênayî yê stranbêj "Rojda" dema ku dere ser sahnê coş zêde bû.

Dexwaza me: ji Şênayî û dîlanên salên pêş tenakî din qîret û şuxil. Tenakî din em, Wana şênayîyan bi çand (kultura) xwe dixwaze dewlemend bikin. Mala we ava be, ciwanên Xelîkan. Hûn tim û tim hebin!

www.arsivakurdi.org

KURDÊN YEKÎTÎYA SOVYETÊ:
BERÊ Û NIHA

Tosinê Reşîd

Salên dirêj, civakên kurdan li Yekîtîya Sovêtê ji bo parastin û bi pêşvebirina ziman û çanda kurdî roleke hêja lîstin. Piştî hevberdana Yekîtîya Sovêtê di wan civakan de guhasinên mezin bûn, lê bi giranîya guhetinên negativ çêbûn. Çawan nav xelkê me de tê gotin: "Yekîtîya Sovyêtê di ser kurdan de hilweşîya". Ez ê di vê gotarê de lêkolîna rewşa kurdan li Yekîtîya Sovêta berê û bandûr û hevberdana Yekîtîya Sovêtê ser wan, bikim.

Çend malûmatîyên dîrokî

Gor kurdnasê rûs Vladîmîr Mînorskî kurd di demên kevnar de li Pişkavkazê bi cîh bûne. Dîroknûsên ereba şênîyên kurdan li vê deverê ji sedsalîya VII AD bîr tînin. Hinek çavkanî di der heqê berxwedana kurdên Balasîkan (Balasakan), ku devê çemê Kurê yê rastê diman, himberî artêşa xelîf di sedsalîya VII de didin[1].

Malbeta Şedadîya (gor Dr. Xelîlê Cindî Reşow kurdên êzdî bûn[2]) salên 951-1088 ji bajarê Anî û salên 971-1174 ji bajarê Gencê hukumdarîya deverên fire dikirin, ku îro ew dever dikevin nav Ermenistan û Azerbacanê. Mîrgehên wan ji alîyê siltanê sêlçûkî Alp Arslan de hatibûn nas kirin. Şedadîya bi karê avadanî û şênkirinê bi nav û deng bûn. Balkêş e, wekî baştirîn kinîsê ermenîya yên bajarê Anî (di dema xwe de serbajarê Ermenistanê bûye), di dewrana Şedadîyan de hatine ava kirin. Şahên Şedadîya usan jî ser çemê Erez pira Xudaferin çêdikin, ku heta îro jî heye[3]. Dergehê Gencê' ku nimûneke hêja, yê hunerê sedsalîyên navîn e û îro li mûzêxana bajarê Tibîlîsî tê parastin, dewrana dethilatdarîya wan li Gencê hatîye çê kirin[4].

Usan jî dîyar e, wekî eşîrên Ogûz sedsalîya XI li devera Şîrvan (Azerbacana îroyîn) êrişî kurdan kirine. Sedsalîya XII kurd li bajarê Beilagan (Azerbacana îroyîn) hebûn[5]. Gor zanîyar û nivîskarê kurd Şamîl Eskerov sedsalîya XIV ji çemê Têrtêr re ku ji çîyayên Kelbecarê (Kurdistana Sor) dest pê dibe, digotin 'Ava Kurda'[6].

Dîroka pêwendîyên kurda û gurca ji sedsalîya VII-IX dest pê dike[7]. Sedsalîyên XII-XIII du birayên kurdên êzdî, yên bi nav û deng, Îvanê û Zakarê Çepildirêj di dîwana şahbanîya Gurcistanê Tamar ê de

www.arsivakurdi.org



Ji alîyê çepê Qanatê Kurdo, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal (1959). Ji arşîva malbeta Qanatê Kurdo.

xwedîyê hêzeke sîyasî û serbazîye mezin bûn û navê wan seranser Rojhilata Navîn belav bibû[8]. Ser mêranî û comerdîya wan şiîr, stran û destan hatine sêwirandin û hê jî tên sêwirandin[9]. Hela wê dewranê gelek kurda xwe wan girt û koçî Gurcistanê kirin. Ew kurd piştî demeke dirêj nav xelkê cîh de bişkivtîn, asîmîle bûn.

Yekem pêla koçberên kurda berbi Pişkavkazê, ku heta îro jî nivşên wan mane, ew 24 eşîrên kurdan bûn, ku sedsalîya XVI şahê Îranê Ebbas I, ji bo parastina tixûbê împêratorîya xwe, yê bakûr-rojava, ji rojhilata Kurdistanî anîn û li deverekê bi cîh kirin, ku beşê wê deverêyî mezin îro dikeve nav Azerbacanê (Kurdistana Sor), beşek jî dikeve nav Ermenistanê (Derelegeza berê)[10].

Çend eşîrên kurdên musulman di dawîya sedsalîya XVII ji deverên Rihayê û Maraşê koçî başûra Gurcistanê dikin û li deverên Mêsxêt û Acar bi cîh dibin.

Kurdên êzdî li împêratorîyên Osmanî û Iranê bin zordarîya duqat de bûn; hin ya netewî, hin jî ya olî. Bi sedsalan tu mafê wan ne dihat nas kirin û dewletên hukumdar ew ji zordarîya musulmanan ne diparastin. Ji ber vê jî herdem çavên wan li welatên usan bû, ku zordarî li wan nehata kirin, li dewletên xaçparêz bû. Di sedsalîya XVIII nêzîktirîn dewleta xaçparêz a serbixwe Gurcistan bû. Sala 1770 î, şahê gurca yê Kartilî û Kaxêtê Îraklî yê II, bi rêya metarnê asûrîya Isay pêwendîya bi êzdîyên bakûra Kurdistanê re girê dide, wekî êzdî piştgirya serbazî bidine wî, ew jî rê bide êzdîya di deverên xwe de hukumdar bin. Şahê gurcan gilî dide serokê

www.arsivakurdi.org

êzdîyan Çoban axa, wekî eger plana wan ser bikeve, wê kela Xoşabê bide wî[11]. Ev hevkarî heta dawî pêk nayê, lê dîsan jî 4.000 malbetên êzdîya koçî Gurcistanê dikin û li bajarê Tilbîsê bi cîh dibin.

Lê koçberîya kurdan bi girseyî berbi Pişkavkazê ji sedsalîya XIX dest pê dibe, gava ew dever dikeve nav împêratorîya Rûsîya. Piştî cengên Rûsîya-Pêrsîya (1804-1813 û 1826-1828) û bi taybetî piştî peymana Turkmênçayê (1828), mafên taybetî ji bo kurdan û ermenîyan, wekî bikaribin koçî deverên împêratorîya Rûsîya bikin, hatin misoger kirin. Êdî sala 1807 an 600 malbetên kurd li Qerebaxê bi cîh dibin[12].

Gava serleşkerê artêşa Rûsîya graf Paskêvîc, sala 1828an parêzgeha Yêrêvanê ji farsa hildide, êdî li wir, devê çemê Erez, êzdî hebûn. Ew ji êla şerqîya bûn û nivşên wan heta niha ji li wê deverê dijîn.Wê demê du gundên êzdîya jî li berpala çîyayê Elegezê, ya rojava, hebûn. Lê divêt şênîyên kurdên êzdî li Ermenistana îroyîn kevntir bin. Li gundê Rîya Teze (Qundaxsaza berê) ku yek ji 11 gundên kurdên êzdî, yên navça Elegezê ye û dikeve bakura çîyayê Elegezê, goristaneke kurdên êzdî heye, ku li gor dîroknasan ji sedsalîyên XVI-XVII heye[13].

Lê piranîya kurdên êzdî piştî cenga Qirimê (1853-1855) û cenga Rûsîya-Osmanîya (1877-1878) koçî Ermenistana îroyîn kirine. Di wê navberê de, sala 1874an du eşîrên êzdîya 'Rojkî' û 'Sîpkî' koçî parêstgeha Qersê dikin, ku wê demê bin destê rûsan de bû[14].

Di sala 1908an de nûnerê mala mîrên êzdîya, Îsmaîl Begê Çol ji bo piştgirîya êzdîya bikin, namekê ji cîgirê qeyser li Tibîlîsî, graf Vorosov-Daşkov re dinvîse. Gor wê namê wê demê li Împêratîya Rûsîya 72 gundên êzdîya hebûn, ku 3500 malbat li wan gundan diman[15].

Salên Cenga Cihanîyê ya Yekem hema bêjî êzdîyên Serhedê gişk (ji wan êzdîyan re Zozanî jî dibêjin) revîne Ermenistana îroyîn û parek jî ji wir derbasî Gurcistanê bûn. (Êzdîyên ne revîn dûarojê bi zor kirin musulman).

Gava artêşa Rûsîya dawîya sala 1917an, (piştî şorişa Oktobrê) ji Pişkavkazê vekşîya, artêşa tirkan kete wê deverê û bi deh hezaran êzdî qir kirin. Sed mixabin di wê qirkirinê de destê begên kurdên musulman jî hebû.

Kurd usan jî li Asîya Navîn bi cîh bûne. Dîyar e, wekî hela sedsalîya XVIII li navça Turkmênîstanê Abîvêrda, kurd hebûn[16], lê dawîya sedsalîya XIX çend eşîrên kurdan ji Xorasanê derbasî Turkmênîstana îroyîn bûne. Sebebên koçberîya wan aborî bûn.

*

Piştî damezirandina Yekîtîya Sovêtê di çar komarên wê de kurd diman; Azerbacan, Turkmênistan, Ermenistan û Gurcistan.

Kurdên Yekîtîya Sovêta berê, di dema rêjîma Stalîn de sê pêlên nefa (sirgûn) dîtine. Ev nefakirin beşeke plana Stalîn bû, wekî deverên ser tixûbê der ji wan gelan va-

www.arsivakurdi.org

la bikin ku mêla wan dikare ser dewleta cînar, seva kurdan Tirkîye, hebe. Nefa yekem di payîza 1937an de pêk hat, gava kurdên musulman ji Ermenistan û Azerbacanê (ji 12 gundên devê çemê Erez ku ser tixûbê Tirkîyê bûn) nefayî Qazaxistan û komarên Asîya Navîn kirin.

Gor dokûmêntên fermî di sala 1937an de, ji Ermenistanê dora 800 kurdên musulman nefayî Qazaxistan û Qirqizistanê kirine[17].

Sala 1944 an kurdên musulman gişk (li gor belgeyên fermî dora 9.000) ji başûra Gurcistanê, navçeyên Mêsxêt û Acar nefayî Qazaxistan, Qirqizistan û Ûzbêkistanê kirin[18]. Hovîtîya nebînayî ew bû, wekî dema nefakirina malbetên kurd, piranîya mêrên ji wan malbatan dijî Almanîya Nazî şer dikirin, Yekîtîya Sovyêtê diparastin. Gelek ji wan, piştî ji ber şêr vegerin demeke dirêj malbatên xwe digerin, heta dibînin. Di sala 1947an de beşek ji kurdên êzdî jî ji Gurcistanê nefayî Qazaxistanê û Asîya Navîn dikin, lê ew êzdî gişk piştî mirina Stalîn vegerîyan Ermenistan û Gurcistanê.

Kurdên Azerbacanê

Dema hukumdarîya Sovyêtê li Azerbacanê hate damezirandin (Nîsana 1920) kurd li wê komarê li van deveran diman; Kurdistana Sor (devera başûr û rojava Qerebaxa Çîyayî (Nagornî Karabaxê), devera Zardaba ku dikeve navenda Azerbacanê û dor Sederek û Teyvazê li Nexçivanê. Li gor hinek çavkanîyên serbixwe, wê demê jimara kurdan tenê li Kurdistana Sor, kurdên Nexçivanê û deverên Azerbacanê mayîn ne nav de, li derdora 60.000 bû[19].

Bi birîyara seroketîya Sovyêtê di 7ê temûza sala 1923an de Kurdistana Sor dibe devereke otonom (navê rûsî; Kurdistanskî Ûyêzd). Lê jîyana vê devera otonom kêmî şeş salan dom dike; bi birîyara Kongra Sovyêtên Azerbaycanê, ya şeşem, di yekîtîyên admînîstratîv de guhastin tên kirin û otonomîya Kurdistana Sor namîne. Tiştekî balkêş e, wekî piştî wê biryarê jî otonomîya ermenîya li Qerebaxê Çîyayî ma. Li Moskva û Bakû xweyê ermenîya hebûn, lê yê kurdan tune bûn. Di 30ê gulana sala 1930î de Kurdistana Sor dîsan dibe devereke otonom, lê jîyana vê otonomîyê jî tenê du meh û nîvan dom dike.

Gerek bê gotin, wekî otonomîya Kurdistana Sor ne bi dilê ermenîya, ne jî yê azarîya bû. Ermenî li dij bûn, ji ber ku ne dixwestin navbera Ermenistan û Qerabaxê de otonomîya kurdan hebe, azarî jî wê bawarîyê bûn, wekî beşeke axa wan dane kurdan.

Çiqas jî Kurdistana Sor wek devereke otonom ji sala 1930-î nema, lê dîsan jî hetanî sala 1938an li wê deverê çalakîyên çandî û perwerdeyî berdewam bûn. Navbera salên 1930-1938 an li dora 30 pirtûkên kurdî bi alfabeya ser bingeha tîpên latînî çap dibin, li dibistanan zimanê kurdî dihat xwendin, ji sala 1931ê rojnama 'Kurdistana Şorevî'

www.arsivakurdi.org

çap dibû. Di sala 1932an de ji bo amadekirina mamostayên zimanê kurdî, beşa kurdî li kolêja Perwerdeyê ya bajarê Şûşî tê vekirin.

Lê vê xweşîyê dirêj dom nekir, rêprêsîyayên rêjîma Stalîn, yên salên 1937-1938 bi hovîtîke nemirovane ji alîyê serokê Azerbacana Sovyêtîyê, Mîrcefer Bagîrov de dijî kurdan hatin bi kêr anîn. Dibistanên kurdî, beşa kurdî ya kolêja Perwerdeyê hatin girtin, çapkirina pirtûkên kurdî hat rawestandin, bi hezaran kurd di nav wan de gelek ronakbir, welatperwer û kesên navdar, bi tawanên bê bingeh hatin zîndan kirin, nefa kirin û kuştin. Bi gilîkî, civaka kurdî li Azerbacanê bêserî kirin û çi xwestin, anîn serê kurdan.

Eger piştî mirina Stalîn li seranserê Yekîtîya Sovyêtê zilm û zor hinekî sivik bû, ji bo kurdên Azerbacanê tişt nehat guhastin. Ji sala 1938an karbidestên Azerbacanê bi hovîtîke nebînayî dijî kurdan sîyaseta bişkavtin, asîmîlekirinê bi rê ve birin. Heta peyva 'kurd' hat qedexe kirin. Armanca vê sîyasetê bi tam asîmîlekirina kurdan bû. Em dikarin bêjin, wekî seroketîya Azerbacanê di vê sîyaseta xwe de, bi ser ket; jimara kurdên Azerbacanê di sala 1926an de 41.193 bû û di sala 1959an de dakete 1.482.

Di gelek çavkanîyên azarîyan de tê gotin, wekî kurdên Azerbacanê ne ku asîmîle, lê întêgre bûne, heta serokê (prêzîdêntê) Azerbacana îroyîn jî kurd e. Awa, Farid Şafee dinvîse: "Kurd yek ji wan kêmanîyê êtnîkî ne, wekî li Azerbacanê baş întêgre bûne. Gelek kurd di hukumata Azerbacanê de gihîştine radeya bilind"[20]. Bi bawarîya me çavkanênîyên azarîya mene, wata peyvên întêgrebûn û asîmîlebûn tev li hev dikin. Întêgrebûn ew e, gava komeke êtnîkîye kêmane, bi parastina nasname, ziman, çande û kevneşopîyên xwe di civaka mezintir de cîhê xwe digre. Lê gava koma êtnîkîye bi wendakirina ziman, çand û kevneşopîyên xwe nav civaka hukumdar de dibişkive, wenda dibe, ew asîmîlasîyon e. Û kurdên Azerbaijanê ne ku întêgre bûne, lê bi zor hatine asîmîle kirin.

Gerek bê gotin, wekî ji kurdên Azerbacanê, kurdên Nexçivanê kurdîtîya xwe hê baş parastin ji ber ku pêwendîyên wan bi kurdên Ermenistanê re xurt bûn.

Dawîya salên 1980î û destpêka salên 1990î malwêranîke mayîn benda kurdên Azerbacanê bû. Di şerê navbera Ermenistan û Azerbacanê de ji bo Qerebaxa Çîyayî, zirara lape mezin gihîşte kurdên Kurdistana Sor. Di salên 1992-93an de hêzên ermenîyan, bêyî ku rastî berxwedaneke rêk û pêk bên, deverên kurdan gişk dagîr kirin. Kurdên deverê gişk bûne peneber û li seranserê Azerbacanê belav bûn. Vê rewşê herçî mayî bişkavtina kurdan bi lez kir.

Piştî serxwebûna Azerbacanê seroketîya wê komarê rê da kurdan navendeke çandî vekin (Ronahî), rojê nîv sihetî programên radîyoyê bi kurdî belav bikin. Salê 2-3 pirtûk û mehanameke bi navê (Dîplomat), tê çap kirin. Lê ev îmkan gelek kêm in û

www.arsivakurdi.org

rewşa kurdên komarê naguhêzin, bişkavtin, asîmîlasîyon berdewam e.

Salên 1989-90î li dora 12.000 kurdên musulman ji Ermenistanê revîn Azerbacanê. Bi hatina wan jîyana çandî nav kurdên Azerbacanê de hinekî geş bû.

Pêwendîyên dostane di navbera Tirkîyê û Azerbacanê de jî bandûre ne baş li ser civaka kurdî dihêlin. Di sala 2001ê de 32 kurd wek alîgirên PKK hatin binçav kirin. Gelek kurdên ji dervayî Azerbacanê hatî, ji welêt hatin der kirin[21].

Di sala 1990î de jimara kurdan bi awayekî fermî li Azerbacanê 13.100 bû, lê gor çavkanîyên kurdan bi xwe îro li Azerbacanê ne kêmî 500.000 kurd hene[22].

Kurd li Tirkmênistanê

Dîroka kurdên Tirkmênistanê, komareke Yekîtîya Sovyêtê ya tirknijad mayîn, wek ya kurdên Azerbacanê ye. Dor serjimara sala 1926an li Tirkmênistanê 22.000 kurd hebûn, sala 1959 jimara wan daket 2.263[23], sala 1970î jimara wan 2.933 bû. Lê gor malûmatên ne fermî ku kurdan dane, jimara kurdan li Tirkmênistanê sala 1970î dor 50.000 bû[24], lê niha dibêt li derdor 200.000 be. Piştî serxwebûna Tirkmênistanê di jîyana kurdên wê komarê de tu guhastinan cih negirt.

Kurdnas Ç. Bakayêv ku salên 1954, 1957 û 1959 ji bo lêkolîna zaravê kurdên Xorasanê, ku kurdên Tirkmênistanê beşek ji wan in, diçe Tirkmênistanê, dinvîse, wekî kurdên wê komarê hê jî ziman û çanda xwe diparastin.

Dawîya salên 20an û bi taybetî salên 30an sedsalîya XX, çawan li komarên Pişkavkazê, usan jî li Tirkmênistanê, ji bo parastin û bi pêşvebirina ziman û çanda kurdî gavên hêja hatin avêtin. Li dibistanên gundên kurdan zimanê kurdî dihat xwendin, ji bo wan dibistanan pirtûkên dersa bi zaravê kurdên Xorasanê, bi alfabe ya latînî (ya Erebê Şemo û Îsahak Moragûlov çê kiribûn) tên çap kirin. Tiştekî balkêş e, wekî kurdnas Îsahak Sûkêrman ser bingehê wan pirtûkan lêkolîna zaravê kurdên Xorasanê kirîye.

Rêprêsîyayên rêjîma Stalîn salên di 1937-38an de, li wê komarê jî dawî bi çalakîyên kurdan anîn. Eger li komarên Ermenistan û Gurcistanê piştî mirina Stalîn hinek mafên kurdan dîsan vegerandin, lê li Tirkmênistanê jî mina Azerbacanê hew tişt dane kurdan, himberî kurdan sîyaseta bişkaftin, asîmîlekirinê bi rê ve birin.

Piştî serxwebûna Tirkmênistanê jî tu mafeke civaka kurdan nehate nas kirin û prosesa bişkaftin, asîmîlekirina kurdan berdewam e.

Kurdên Gurcistanê

Piştî Cenga Cihanîyê ya Yekem, kurdên ezdî bi giranîya xwe ve li Gurcistana îroyîn, li bajarê Tibîlîsî diman. Civakên ne mezin usan jî li bajarên Têlavî û Batûmî hebûn. Tê gotin, wekî li çend gundên Kaxêtê jî êzdî diman. Lê kurdên musulman li gundê deverên Mêsxêt û Acar diman.

www.arsivakurdi.org

Salên Cenga Cihanîyê ya Duyem û salên nangiranîyê dû re hatin, ji ber rewşa aborî gelek malbetên kurdên êzdîya ji Ermenistanê koçî Gurcistanê dikin.

Piştî komara Gurcistanêye Soyvêtê hat damezirandin, sala 1921ê, li Tibîlîsî klûb û dibistanên kurda hatin vekirin, komên folklorî, yên govend û stranan çanda kurdî geş dikirin.

Di sala 1922an de Ahmedê Mîrazî û Lazo (Hakob Xazaryan) li bajarê Tibîlîsî dibistana êvarê ji bo zarokên kurdan vedikirin. Di wê dibistanê de ji bo zimanê kurdî alfabeya ser bingeha tîpên ermenî dihat bi kar anîn ku Lazo di sala 1921an de çêkiribû. Ew dibistan heta sala 1929an hebû û ji kesên li wir xwendî çendek dûarojê bûne mirovên bi nav û deng: zimanzan Qanatê Kurdo û Çerkez Bakayêv, berpirsîyarê rojnama 'Rîya Teze' Cerdoyê Gênco, mêrxasê Yekîtîya Sovyêtê Semendê Elî Sîyabandov, kurdnas Xalit Çetoyêv û çendekên mayîn.

Lê ji dawîya salên 1930an (salên rêprêsîya rêjîma Stalîn), heta salên 1960an hukumata Gurcistana Sovyêtê alîkarîya ji bo parastin û bi pêşvebirina ziman û çanda kurdî rawestand. Ji nîveka salên 196oî hukumata komarê ji nû ve guhê xwe da kurdan û daxwezên wan. Salên 1960-80 Tibîlîs bû navendeke çanda kurdî. Li neh dibistanên wî bajarî, ku zarokên kurd lê pir bûn, zimanê kurdî dihat xwendin, şanoya kurdî ya Tibîlîsî çawan li Gurcistan û Ermenistanê, usan jî li Qazaxistanê, Sûrîye û Fransê berhemên xwe pêşkêşî bînaran dikir. Bi komên govend û stranên folklorî re, komên sazbendîya kurdî yên hemdem derketin meydana çanda kurdî. Nûnerê kurdan li parlamênta komarê hebû. Di demeke kurt de gelek hunermend, bi taybetî şêwekar bi pêş de hatin. Li radîyoya dewletê programê zimanê kurdî hebûn û li Yekîtîya Nivîskarên Gurcistana Sêksîya (beşê) Nivîskarê Kurdan kar dikir.

Gerek em bîr bînin, wekî piştî kurdên musulman di sala 1944an de ji Gurcistanê hatin nefa kirin, em dikarin bêjîn kurdên mayî gişk êzdî bûn.

Kurdên êzdî ku li dora sêsed salî li vê komarê dijîn jimara wan çiqas çû, zêde bûn û di sala 1989an de gihîşte 33.000. Îmkanên hukumata Gurcistana Sovyêtê dayî alî kurdên êzdî kirin ziman, çand û nasnama xwe biparêzin. Lê piştî têkçûna Yekîtîya Sovyêtê rewş bi carekê ve têk çû.

Îro kurdên êzdî li Gurcistanê bi dijwarîke mezin dixwezin ziman û kevneşopîyên xwe, dezgehên çandî û yekîtîya xwe biparêzin, ji berjewendîyên xwe, yên sîyasî û çandî re xwedî derkevin. Li gor bawerîya nûnerên rêxistinên navnetewî, ev civaka kêmane ku dikaribû bi parastina nasname, ziman û çanda xwe bi civaka Gurcistanê ve întêgre bibûya, niha rû bi rûyî wendakirina ziman, nasname û kevneşopîyên netewî bûye. Prosesa asîmîlasîyonê wek penceşêrê çenckên xwe di bedena wê de bi cîh dike[25].

Yek ji xeterên mezin ku civaka kurdên

www.arsivakurdi.org



Nazê Şîray, kurdeka artîst a sîrkê ye. Wê bi xwe ev foto di sala 1975 an de daye min.

www.arsivakurdi.org

êzdî li Gurcistanê rû bi rû bûye, ew derketina êzdîyaye dervayî welat e. Ev yek berî gişkî bi sebebên aborî pêk tê. Koçberîya êzdîyan ji Gurcistanê bi radeke mezin îmkanên wê civaka êzdîya mirovî û darayî kêm dike.

Eger em rewşa Gurcistanê ya piştî serxwebûnê bînin ber çavan, em ê bibînin, wekî tenê malbetên dikaribûn xercê rêyî giran bidin, ji welêt derketin. Usane kesên derketin, dewlemend û serkêşên civaka kurdên êzdî bûn. Derketina van kesên dewlemend îmkanê civakê kêmtir kirin, ew jî gava hukumata Gurcistana serbixwe arîkarîya civaka kurda daye rawestandin. Dikarî bêjî, wekî civaka kurdên êzdî di demeke kurt de destkevtinên salên sovyêtê gişk wenda kirin; şanoya kurdî sala di 1992an de hat girtin, komên govend û stranên kurdî hêdî-hêdî beta vebûn, şûnên berevbûn û organîzekirina çalakîyên civakî û çandeyî neman.

Ji alîkî mayin ve piranîya dunaven êzdîyan (şêx û pîr) ji Gurcistanê derketin, çi ku pêkanîna pêwîstîyên olî dijwar kir. Vê bûyarê jî ji alê xwe de rê da tekîyên xaçparêze radîkal ku nav êzdîyan de bi êginayî kar bikin.

Kêmbûna jimara kurdên êzdî, tunebûna cîhên hevdîtinê, bandûra nêgatîv li ser zimanê kurdî jî dihêlin.

Daxweza kurdên êzdî ku bi yekîtîya radeyeke bilind berjewendîyên xwe, yên sîyasî û çandeyî biparêzin, eger bi tam têk neçûye, lê hêvî jî nemaye.

Gerek bê gotin, wekî kêmanîyên etnîkîye mayîn gişk jî ji der alîkarîyê distînin, ermenî, azarî, rûs, ûkrayînî dewletên wan pişta wan in. Heta asûrî jî, ku dewleta wan a serbixwe tune, baylozxana Vatîkanê li wan xwedî derdikeve[26]. Tenê kurdên êzdî bêxwedî mane.

Gava kurdên êzdî behsa mafên xwe yên sîyasî dikin, media gurca wan di cudaxwezîyê (sêparatîzmê) de tawanbar dike. Nûnerên hukumatê heta mafê çandî jî ji bo êzdîya zêde dibînin. Awa serokê Palata zimanê gurcî Lêvan Gvîncîlîya dibêje: "Li welatê demokratîyê hukumat xema civakê bi gştî dixwe, lê ne ya dîasporayên netewên cihê"[27].

Faktoreke mayîn jî ku bandûreke nêgatîv li ser civaka kurdên êzdî yên li Gurcistanê dihêle, sîyaseta wî welatî, ya der e. Seroketîya Gurcistanê berjewendîyên civaka kurdî ji pêwendîyên bi Tirkiye re dike cangorî. Bo nimûne, dema serjimara sala 2002an di stûna netewa ya forma serjimarê de navê kurda tune bû, lê navê tirkan hebû, ew jî gava jimara kurdan wê demê bêtirî 20.000 bû, lê jimara tirka tenê digihîje çend kesan.

Bi bawarîya Davîd Szakonyi, ku lêkolîna rewşa kurdên êzdî li Gurcistanê kirîye, faktorên nêgatîve ku bandûra xwe ser rewşa kurdên êzdî hîştin, ev in[28];

Cêrge guhastinên sîyasî û aborî li Gurcistanê piştî sala 1991ê ku bûn sebebê koçberîya gelek êzdîyan;

Tunebûna yekîtîyê, pirbûna rêxistinên

www.arsivakurdi.org



Pîrejina kurda ji Ermenistanê (1985). Ji arşîva Tosinê Reşîd

biçûk û pirsa nasnamayê (êzdî yan kurd) hêza civakê sist kirin; Di prosesa damezirandina dewletê de nasnameya gurcbûnê kirin bingeh û rê nedan kêmenetewên Gurcistanê.

Piştî têkçûna Yekîtîya Sovyêtê civaka kurdan li Gurcistanê ji alîyê sîyasî, aborî û civakî mahrûm bû. Eger civaka kurdî nikaribe ji vê rewşê derkeve û alîkarî ji der tune be, ew civak dikare ji dest here. Usan jî sal bi sal jimara kurdan li Gurcistanê kêm dibe, eger sala 1989an jimara wan li wê komarê 33.331 bû, sala 2002an ew jimar daket 20.843, lê gor bawarîya kurdên Gurcistanê bi xwe, jimara kurdên mayî niha ne zêdeyî 6.000 e[29].

Kurdên Ermenistanê

Rewşa kurdên Ermenistanê timê jî ji rewşa kurdên komarên Yekîtîya Sovyêtê yên mayîn cihê bûye; nasîyonalîzma kurdan timê jî li vê komarê xurtir bûye. Ji alîkî mayîn ve seroketîya komara Ermenistana

www.arsivakurdi.org

Sovyêtîyê pir caran destê alîkarîyê dirêjî civaka kurdan kirîye. Ev yek dikare bi wê yekê bê şirovekirin, wekî piranîya kurdên Ermenistanê êzdî bûn û navbera êzdîya û ermenîyan de dostanîke dîrokî hebû.

Hema ji destpêka damezirandina komara Ermenistana Sovyêtê (29.11.1920), seroketîya komarê biryar da ku li dibistanên gundên kurdan zimanê kurdî bê xwendin. Ji bo vî karî pêwîstî, pêdivîya alfabeke zimanê kurdan hebû. Di sala 1921ê de, Lazo (Hakob Xazaryan) ser bingeha tîpên ermenî alfabeya zimanê kurdî çêdike û havîna wê salê yekem pirtûka bi zimanê kurdî "Şems" çap dibe. Berê li sêwîxanan (berî gişkî ya Aştarakê), dû re jî di gundên kurdan de zaro bi vê pirtûkê fêrî xwendin û nivîsara zimanê kurdî dibin. Êdî sala 1921ê di 5 gundên kurdan de dibistanên kurdî tên vekirin.

Di sala 1921ê de kongra êzdîyên li dor çîyayê Eledezê tê li dar xistin, dawiya wê salê kongra ermenî û êzdîyên peneber tê li dar xistin. Êdî di sala 1922an de nûnerên kurdên êzdî li parlamênta (Sovyêta Tewrebilind) komara Ermenistanê tên hilbijartin[30].

Ji bo başkirina rewşa kurdan ji alîyê seroketîya partî û hukumata Ermenistanê de gelek biryar tên girtin. Kurdên êzdîye peneber ku li bakurê Kurdistanê gund û şênîyên xwe hiştibûn û revîbûn Ermenistanê, neçar bûn koçerîyê bikin. Piştî demeke ne dirêj hukumatê ew li gundan bi cîh kirin û hinek cîhan jî ji wan re gundên nû ava kirin. Ji sala 1925a heta 1928an 20 gund dane kurdên peneber. Wan salan usan jî ji bo hildana nexwendîtîyê karekî berbiçav tê kirin.

Di sala 1922an de jimara kurdan li Ermenistanê li der dor 8,5 hezaran bû ku piranîya wan kurdên êzdî bûn.

Piştî şorişa Şêx Seyîd beşek kurdên musulman ku salên Cenga Cihanîyê ya Yekem ji Rûsîya revîbûn û devera Wanê bi cîh bibûn (dor 4 hezar malbet, ku ji eşîrên Brûkî, Banokî, Misirkî û Celalî bûn) dîsan vegerîyan û jimara kurdan li komara Ermenistanê gihîşte 15,5 hezaran.

Di sala 1925an de yekem kongra kurdên ne partî ji hukumata Ermenistanê dixwaze, wekî alfabeya kurdî ser bingeh tîpên latînî bê damezirandin. Ew kar ji alîyê Îsahak Moragûlov û Erebê Şemo ve di sala 1928an de pêk hat û ji sala 1930î ew alfabe di dibistanên kurdî de dihat bi kar anîn. Ji 31.03. 1930 rojnama 'Rîya Teze' bi wê alfabeyê tê weşandin. Sala 1931ê kolêja Pişkavkazêye Perwerdeyê, ya kurdî tê vekirin, ku ji bo dibistanên kurdî mamostan amade dikirin.

Sala xwendinêye 1931/32 li Ermenistanê 27 dibistanên kurdî hebûn, di sala 1937an de jimara wan dibistanan digihîje 48 an. Ji sala 1929 an heta 1932an 21 pirûkên dersan tên çap kirin. Di sala 1925an de Ermenistan dibe mazûvana kongira kurdên Pişkavkazê.

Wan salan di aliyê çandî de jî gavên hêja hatin avêtin. Di sala 1926an de fîlma 'Zerê' tê kişandin, ku mijara wê jîyana kurdan bû û çend kurdan wek aktor di wê de dilîstin.

www.arsivakurdi.org

Ew fîlm bi bingeha xwe ve êtnografî bû, jîyana kurdên wê deverê dianî ber çavan. Wê salê usan jî fîlmeke dokûmêntal bi navê "Kurd û Êzdî" tê kişandin.

Sala 1934an konfêransa kurdên Yekîtîya Sovyêtê li Yêrêvanê tê li dar xistin. Kurd û kurdnasên ji hersê komarên Pişkavkazê û Tirkmênistanê, usan jî ji bajarên Moskva û Lenîngradê beşdarî wê konfêransê dibûn. Konfêrans bi taybetî li ser van mijaran radiweste; standartkirina zimanê kurdî, guhêrînên civakî-aborî û bandora wan ser zimanê kurdî, rêforma alfabeya bi tîpên latînî, rêziman û têrmînalogiya kurdî. Konfêrans usan jî ciyê hêja dide pirsa bipêşvebirina çanda kurdî, parastina kelepora netewî; bi taybetî folklor, sazbendî û tiştên bi dest tên çêkirin.

Gerek bê gotin, wekî ji bo parastin û bipêşvebirina çanda kurdî hukumatê alîkarîke berbiçav dida. Di sala 1937an, de li gundê Elegezê, şanoya Kurdî ya dewletê ku şanoyeke profêsîyonal bû, tê damezirandin. Ew şano li hersê komarên Pişkavkazê derdiket pêş temaşevanan. Komên govend û stranên kurdî çawan li komarên Pişkavkazê, usan jî li Moskvayê konsêrt didan.

Yekem nimûna wêjeyî bi zimanê kurdî di sala 1931ê de çap dibe, lê di sala 1932an de yekem salnameya nivîskarên kurd çap dibe. Gerek bê gotin, wekî piranîya nivîskarên wê nivşê li sêwîxanan mezin bibûn, li wir fêrî xwendin û nivîsandinê bibûn.

Ji sala1929an heta 1937an bêtirî 70 pirtûk bi zimanê kurdî çap dibin.

Li Ermenistanê jî, çawan li komarê Yekîtîya Sovyêtêye mayîn, salên rêprêsîya rêjîma Stalîn (1937-38) pêşvaçûna ziman û çanda kurdî rawestîya. Dibistanên kurdî, kolêja Perwerdeyê, rojnama 'Rîya Teze', Sêksîyona Nivîskarên Kurd li Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê, programên kurdî bi radîyoyê, hema bêjî her tiştê kurdî bilî şanoya Kurdî ya Elegezê, hatin girtin. Şanoya Kurdî jî di sala 1947an de hat girtin. Gelek ronakbir û navdarên kurd bi tawanên bê bingeh, hatin girtin û nefa kirin; Erebê Şemo, Hecîyê Cindî, Cerdoyê Gênco, Ahmedê Mîrazî, Cangîr Axa, Şamil Têmûrov...

Piştî mirina Stalîn, bi taybetî ji sala 1955an, di jîyana kurdên Ermenistanê de guhastinên mezin bûn. Wê salê Sekrêtarê Yekemîn ya Partiya Kommunîst a Ermenistanê, Sûrên Tovmasîyan, ku nu hatibû hilbijartin, komeke ronakbir û sîyasetmedarên kurd vexwandine bal xwe û bi wan re ser pirsa ji nû ve geşkirina ziman û çanda kurdî gotûbêj kir. Piştî wê rasthatinê ji nû ve dest bi weşana rojnama 'Rîya Teze', programên zimanê kurdî bi radîyoyê bûn. Beşa Nivîskarên Kurd li Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê dîsan dest bi karê xwe kir, jimara pirtûkên bi zimanê kurdî dihatin çap kirin zêde bû. Rast e dibistanên kurdî êdî nehatin vekirin, lê di dibistanên gundên kurdan û gundên kurd lê pir, heftê du saetan ziman û wêjeya kurdî dihat xwendin. Dîsan wê salê ji bo amadekirina mamo-

www.arsivakurdi.org



Sê keçên kurd û kurê birê wan ji Ermenistan (1956), Ji arşîva Tosinê Reşîd

stayên zimanê kurdî li kolêja Perwerdeyê ya ermenîyan, beşê kurdî hat vekirin. Di sala 1959an li înstîtûta Rojhilatnasîyê beşa Kurdnasîyê hat vekirin, lê di sala 1970î de ji bo amadekirina pisporên kurdnas, li Zanîngeha Yêrêvanê beşa kurdnasîyê hat vekirin.

Di salên 1970an de, li gundê Elegezê, ku navenda 11 gundên kurdên êzdî ye, şanoya kurdî ji nû ve hat vekirin, lê vê carê êdî ne şanoya profêsîyonal bû. Lê dîsan jî wê şanoyê gelek pîyêsên nivîskarên kurd û yên ji zimanên mayîn wergerandî derxistin ser sehnê û raberî bînarên Ermenistan û Gurcistanê kirin. Ji dawîya salên 50an jimara xwendkarên kurd li zanîngeh û înstîtûtên Ermenistanê zêde bûn, ji nav kurdan gelek kesên navdar derketin, çendek ji wan li seranser Ermenistanê û ji tixûbê wê der hatin nas kirin

Di sala 1959an de bi senaryoya Erebê Şemo fîlma dokumêntal "Kurdên Ermenistana Sovyetê" tê kişandin. Wê fîlmê jîyana kurdên Ermenistanêye rojane û destkevinên wan ên salên sovyêtîyê dianî ber çavan.

Ji destpêka salên 1930an heta dawîya salên 1980an li Ermenistanê gelek pirtûk bi zimanê kurdî hatin çap kirin. Îro li pirtûkxana Komara Ermenistanêye Netewî 686 pirtûkên bi zimanê kurdî hene. Pirtûkên bi zimanê kurdî usan jî li pirtûkx-

www.arsivakurdi.org

ana Akadêmîya Zanyarîyê ya Komara Ermenistan û li pirtûkxanên gundên kurdan hene.

Eger piştî hevberdana Yekîtîya Sovyetê bi pêş ve çûna ziman û çanda kurdî li Ermenistanê bi tam ranewestîya be jî, gelek sist bûye. Rojnama 'Rîya Teze' salê tenê çend hejmar çap dibin, programên kurdî bi radîyoyê ji rojê saet û nîvekê bûne nîv saetî û ji bo wî nîv saetî jî îmkan kêmin. Beşa kurdnasîyê li înstîtûta Rojhilatnasîyê nemaye, şanoya kurdî nemaye, komên folklorê nemane. Hinek îdarên mayî jî, tenê bi nav hene.

Ev rewşa nêgatîv berhema sîyaseta seroketîya Ermenistana serbixwe ye. Ev sîyaset bi du rêya hate bi rê ve birin; cihêkirina êzdîya ji kurdan û derkirina kurdên musulman ji Ermenistanê.

Dema konflîkta navbera Ermenistan û Azerbacanê musulmanên Ermenistanê gişk, kurd jî di nav de, bûne hedefa êrişên komên çekdar û hukumatê tu tişt nekir, wekî wan êrişan rawestîne. Ev jî bû sebeb, wekî kurdên musulman ji Ermenistanê derkevin.

Kurdên êzdî û ermenî bi dîrokî dostên hev bûne. Dema Cenga Cihanîyê ya Yekem ji bo piştgirtina ermenîyan, tirkan dor mîlîyonek kurdên êzdî li devera Tur Abdînê qir kirin. Zivistana sala 1915/16 êzdîyên Şengalê gelek malbatên ermenî di malên xwe de xwedî kirin. Dîsan jî di sala 1918an de êzdîyan, bi taybetî desta Cangîr Axa ku ji 750 sîwarî pêk dihat, bi ermenîyan re tevayî Ermenistana îroyîn ji tirka parastin. Vê dostanîya dîrokî rê neda seroketîya Ermenistanê êzdîyan ji derxin.

Di sala 1988an de ji bo Qerebaxa Çîyayî ji Azerbacanê biqetînin û bigihîne Ermenistanê, li Ermenistanê û Qerebaxê tevrabûneke mezin dest pê bû ku piştî demekê gîhande şerê vekirî navbera herdu komaran de. Pêwendîyên ermenî û kurdan ku çend dehsalên dawî nerm bibûn, têk çûn, bi 211.000 azarîyan re dor 15.000 kurdên musulman ji Ermenistanê der çûn[31].

Bi serhildana ermenîyan re (1988) nav êzdîyan de jî tevrabûnekê dest pê kir, ku daxwez dikir êzdîya çawan netewekî ji kurdan cihê nas bikin. Gerek bê gotin, wekî ev tevrabûna êzdîya ji alîyê karbidestên ermenîyan de hatîbû amade kirin û ji alîyê wan ve jî dihat bi rê ve birin. Awa, kongara ku rêxistina êzdîya damezirand, ji alîyê du rojhilatnasên ermenî ve dihat bi rê ve birin; Garnik Asatryan û Arşak Poladyan. Lê ronakbirên kurdên êzdî, wek nivîskar, dr. Eskerê Boyîk qet nehîştin bikeve xanîyê kongre lê dikirin.

Êzdî beşekî gelê kurd in û ji alîyê seranser cihanê de usan tên naskirin. Lê çend zanîyarên ermenî, bi seroketîya Garnîk Asatryan, piştgirîya daxweza cihêkirina êzdîya ji kurdan dikin. Ew bi lêkolînên awa gotî 'zanîyarî' dixwazin mak bikin, wekî êzdî ne kurd in, êzdî komeke êtnîkîye ji kurdan cihê ne. Ev yek bi xwe re xetereke mezin tîne, bi vê cihêkirinê êzdîyên Ermenistanê ji civakên

www.arsivakurdi.org



Sazbendên koma folklora kurdî ji gundê Elegezê (1936). Ji arşîva Hecîyê Cindî.

êzdîyaye mayîn diqetin, dûr dikevin, ew usan jî ji koka xwe ya dîrokî û çandeyî tên birîn, çi ku bişkaftin, asîmîlekirina wan hêsan dike [32].

Bawerîya wekî êzdî ne kurd in, berê jî nav pareke êzdîyan de hebû û ew bawerî bi taybetî piştî kesên wek Bayazîd Îsmaîl beg û birayên wî salên 1970-80 ji Îraqê hatin nav êzdîyên Ermenistanê, bêtir belav bû. Wan digotin 'êzdî ne kurd in' û xwe wek nûnerê mala mîrên êzdîya didan nasandin. Ji ber vê jî gelek êzdîyan bawerîya xwe bi wan anî.

Ji alîkî mayîn ve, piştî derkirina kurdên musulman jî mediya ermenîya propoganda li dijî kurdan ranewestand û kurdên êzdî tirsîyan, wekî rojekî dikarin wan jî der bikin.

Gerek bê gotin, wekî heta destpêka sedsalîya XX êzdîya nasnama 'kurd' dipejirandin. Lê ev yek piştî Cenga Cihanîyê ya Yekem hat guhastin. Dema qira ermenîya bi deh hezaran êzdîyên Serhedê jî hatin qirê û hinek kurdên musulman jî tevî qirkirina wan bûn. Ji wê demê gelek êzdîyên Kavkazê xwe bi nasnameya êzdî didan nasandin. Lê dîsan jî Şorişa Başûra Kurdistanê nav kurdên êzdî de hestên netewî geş kirin û kêm kes mabûn, wekî digotin em ne kurd in.

Faktoreke mayîn jî heye, ku divêt neyê ji bîra kirin. Li Ermenistanê heta sala 1965an nav xelkê de, lê ji sala 1965an bi awayekî vekirî û fermî propoganda dijî kurdan diçû, di komkujîya ermenîya ya salên Cenga Cihanîyê ye Yekem de, berî gişkî kurd ta-

www.arsivakurdi.org

wanbar dikirin. Ji alîkî mayîn ve ji alîyê karbidestên Ermenistanê gef li êzdîyan dixwerin, zor li wan dihat kirin, wekî bêjin em ne kurdin. Van faktora gişkan rola xwe lîst, beşekî êzdîyayî mezin ne xwestin, wekî ji wan re bêjin kurd.

Di sala 2001ê de parlamênta Ermenistanê 'êzdîkî' wek zimanekî ji kurdî cihê pejirand, di îlona sala 2006an pirtûkên zinanê 'êzdîkî' (ku kurmancî bûn bi tîpên Kîrîlî) ji alîyê hukumata Ermenistanê de hatin çap kirin û li gundên êzdîyan hatin belav kirin. Serokên dibistanên piranîya gundên êzdîya ev pirtûk ne pejirandin. Van bûyara dutîretîya civaka êzdîya hê mezin kir.

Tiştekî balkêş e, wekî êzdîyên di gundên cihê de dijîn, dibêjin 'em kurd in', lê êzdîyên di gundên ermenîya de dijîn dibêjin 'em êzdî ne, ne kurd in'. Awa êzdîyên marza (navça) Aragatsotn, ku 11 gundên êzdîyan li wir in, dibêjin 'em kurd in, lê kurdên êzdî ne' û tu kesî li wê deverê pirtûkên 'êzdîkî' nepejirandin. Ev jî mak kirineke wê bawarîyê ye, wekî gelek êzdî ji tirsa dibêjin em ne kurd in.

Ji bo ronakbirên kurdên êzdî (ku xwe kurd nas dikirin û dijî cihê kirina êzdîya bûn ji kurdan), ber çavên xelkê reş bikin, nasîyonalîstên ermenîya ew bi piştgirtina Azerbacanê tawanbar dikirin[33]. Ne dijwar e tê bigihîjin, gava şerê giran navbera Ermenistanê û Azerbacanê de diçû, tawana wa dikaribû bigîhanda çi. Bi her cureyî dixwestin çavên ronakbirên kurdên êzdî bitirsînin û ne tenê ditirsandin. Sala 1991 ê profêsorê bi nav û deng, nivîskar Sihîdê Îbo, ro nava rojê li cîhê kar kuştin û heta îro jî kujarê wî nehatîye dîyar kirin. Ji alîkî mayîn ve seroketîya Ermenistanê êzdîyên ku digotin em ne kurd in, derxistin dijî ronakbirên kurdên êzdî. Van bûyaran bi rewşa aborîye gran ve, gelek ronakbirên kurdên êzdî neçar kirin ji Ermenistanê derkevin.

Rêxistinên êzdîyaye ku xwe wek netewekî cihê dibînin, du mehnama çap dikin: 'Laliş' û 'Êzdîxane'. Herdu jî bi zimanê ermenî çap dibin û nivîskarên ku gotarên giring dinvîsin, ermenî ne.

Bi bawerîya me ev sîyaseta seroketîya ermenîya ji wê yekê tê, wekî ew ditirsin rojekê kurd bixwezin beşekî Ermenistana îroyîn wek axa Kurdistanê nas bikin. Ev sîyaset di van gotinên mamosta zanîngeha Yêrêvanê, profêsor Vîktorîya Arakêlova de dîyar dibe: "Bi serî berhemên rojhilatnasên ermenîya êzdî wek grûpeke êtno-olîye cihê hatin pejirandin. Ev ji bo asayîşa netewî faktoreke gelek giring e, wê xetera ku li Ermenistanê 'faktora kurdî' heye, ji me dûr xist"[34].

Gor nêrînên rêxistinên navnetewî, li Ermenistanê kêmenetewe ji alîyê sîstêma mafnasîyê de nayên parastin û nonertîya wan di mêkanîzma hukumatê de gor jimara wan nîne[35].

Îro êzdî mezintirîn kêmenetawa Ermenistanê ne, jimara wan dor 40.000 e. Lê seroketîya Ermenistana serbixwe pêvîstîyên êzdîya çawan civak ku ji hêzê, dewlemendîyê û tesîrê hatiye dûr xistin, hesav hilnedan. Di

www.arsivakurdi.org

van şertan de êzdîya nikaribû xwedî ji mafên xwe, yên aborî, civakî û çandeyî derkevin. Gelek caran ji alîyê polîs û dadmendan de jî zordarî li êzdîyan tê kirin.

Gor bawerîya serokêYekîtîya Netewî, ya Êzdîyen Ermenistanê Ezîz Tamoyan, êzdî bêyî ku bêne parastin dijîn. Mal û hebûna êzdîya talan dikin, agir berî malên wan didin. Kesên van kara dikin zanin ji ber ku qurbanî êzdîne, ew bên girtin jî wê tenê hinek cirm bidin. Êzdî ji alîyê yasayê ve nayên parastin, yasa divêt ji bo gel gişkî weke hev be. Ew berdewam dike: "150 malbetên êzdîya ji xanîyên wan der kirine, niha li kolanan dijîn, ermenî ketine xanîyên wan. Hukumat vê yekê zane[36].

Di hevpeyvineke mayîn de ew dibêje, wekî hinek êzdîyên perê bajer diman, axa wan, xanîyê wan hebûn, niha hatine der kirin, neçar mane ji welêt herin. Êzdîya pez, dewarê xwe li zozana diçêrandin, zozan jî ji dest wan girtin, ew jî neçar man ji Ermenistanê koç bikin. Dibe ku 50% êzdîya êdî ji Ermenistanê koç kirîye[37].

Berî hevberdana Yekîtîya Sovyêtê li parlamênta Ermenistana Sovyêtîyê (Sovêta Tewrebilind, ya Komara Ermenistana Sovyêtê) nonerên kurdan hebûn, lê piştî têkçûna Yekîtîya Sovyêtê tu nonerekî kurdan (êzdîyan) li parlamênta Ermenistanê tune. Cîhe bê bîranîn, wekî li parlamênta Herêma Kurdistanê ji bo ermenîyên Kurdistanê, ku jimara wan gelekî ji ya êzdîyên Ermenistanê kêmtir e, cîhek hatîye cihê kirin.

Çiqwas jî êzdîyan wek civak karibûn li Ermenistana serbixwe xwe biparêzin, lê dîsan jî ew di pirsên xwedîtîya axê, avê û zozanan de rastî dijwarîyên mezin tên, nonerê wane sîyasî di seroketîyê de tunene.

Li Ermenistana îroyîn, çawan civakeke êtnîkî bêyî piştgirtina dewleta der, êzdî rû bi rûyî binpêkirina mafê xwe yên sîyasî û sîvîl dibin. Tunebûna yekîtîyê di civakê de, alozkirina pirsa nasnameyê (êzdî, kurd), tune bûna nonertîya sîyasî, çi li parlamêntê, çi li hukumatê, civaka êzdîya li Ermenistanê bê hêz dikin û ew civak roj bi roj destkevtinên dewrana hebûna Yekîtîya Sovêtê dest xistibûn, unda dike.

*

Çawan em rewşa kurdên Yekîtîya Sovyêta berê dibînin, kurdên Azerbacanê û Turkmênistanê bişkivtîn, asîmîle bûn, lê kurdên Ermenistanê û Gurcistanê, ku ew jî heman sîstêma sosyalîzmê de diman, xwe parastin, asîmîle nebûn. Vê fênomênê em bi du faktoran dikarin şirove bikin. Ya yekem; kurdên Ermenistanê bi piranîya xwe ve, kurdên Gurcistanê jî gişk, êzdî bûn. Ola êzdîya rê li ber bişkavtin, asîmîle bûna wan girt.

Anegor ayîna ola êzdîya, zimanê kurdî pîroz e. Sala 1932 an Şêx Heyderê êzdî di kovara "Hewar" de dinvîse: "Zimanê me kurmancî ye. Şîrintirîn zimanê di dinyayê ye. Ji lewra Xwedê jî pê axvîye. Pelê kitêba me dibêje: "Xwedê bi zimanê kurmancî ê sîrin ax-

www.arsivakurdi.org

ivîye." Ber wê yekê "Meşeba Reş" bi zimanê kurmancî dahatûye"[38]. Êzdîyên Kavkazê usan jî wê bawarîyê ne, wekî bi spartina Xwedê, Melekî Tawis Adem fêrî axavtinê kirîye û ew bi Adem re bi zimanê kurdî (ew dibêjin kurmancî) axivîye. Ew bawar dikin, wekî zimanê kurdî yekemîn ziman e li rûbarê dinê û pîroz e. Hin jî gor ola êzdîyan, mafê êzdîya tune bi kesên ji ol û neteweyên mayîn re bizewicin. Ev jî astengek bû pêşîya bişkavtinê. Faktora duyemîn jî, wekî kurdên Ermenistanê u Gurcistanê ji bişkavtinê parastin ew bû, wekî dema sovêtê di sîyaseta komarên Ermenistanê û Gurcistanê de plana bişkavtina kurdan tune bû.

Li Azerbacanê û Turkmênistanê kurd jî wek netewên desthilatdar, azarî û turkman, musulman û bi piranîya xwe ve şiîya bûn. Ew bi hêsanî ji hev dizewicîn û nav hev de dibişkivîn. Kurdên wan komara giringîya mezin ne didan parastina zimanê kurdî, ji xwe rabûn-rûniştandin, kevneşopîyên wan jî gelekî nêzîkî yên azarîya û turkmanan bibûn. Ji alîkî mayîn ve seroketîyên wan komarên tirknijad, wek hukumata Tirkîyê, sîyaseta bişkavtin, asîmîlekirina kurdan bi rê ve dibirin. Ev sîyaset bi taybetî, bi hovîtîke mezin ji alîyê seroketîya Azerbacanê ve dihat bi rê ve birin.

*

Hukumatên dewletên Pişkavkazê; Azerbacan, Ermenistan û Gurcistan hê jî ji naskirina mafên kêmanîya yên piralî, ku dikaribû rê bida kurda û kêmanîyên mayîn mafên xwe biparêzin, xwe dûr digrin. Eger kêmanîyên mayîn xwe spartine piranîya dêmografî, ya cîh (li hinek deveran ew piranî ne), yan alîkarîya dewleta der, kurd lap bêpişt mane. Piştî têkçûna Yekîtîya Soyvêtê ku bi xwe re dijwarîyên aborî û bilind bûna pêla nasîyonalîzmê û konflîktên êtnîkî anî, bi deha hezaran kurd ji komarên Piştkavkazê (Azerbacan, Ermenistan û Gurcistan) usan jî ji komarên Asîya Navîn (Qirqizistan û Ûzbêkîstan) neçar man koçber bibin. Piranîya wan li Rûsîya Federal û Qazaxistanê, parek li komarên Yekîtîya Soyvêtêye mayîn û pareke biçûk jî li welatên Evropa Rojava, bi taybetî li Almanîya, Belçîka u Holanda bi cîh bûn.

Piranîya kurdên musulman ji Ermenistanê, Azerbacanê, Qirgizistanê û Ûzbêkistanê ji ber dijwarîyên aborî û konflîktên êtnîkî koçî Qazaxistanê kirin. Gerek bê gotin berî hevberdana Yekîtîya Sovyêtê kurdên Qazaxistanê êdî baş întêgre bibûn, nav wan de kesên navdar û dewlemend hebûn û kurdên ji komarên mayîn xwe wan girtin. Gor çavkanîyên kurdan jimara kurdan li Qazaxistanê niha deve-devî 150.000 e. Li Qzaxistanê rêxistinên kurdaye civakî karekî hêja dikin; kovar û rojnamên kurdî tên çap kirin, pirtûkên kurdî, di nav wan de yên ji bo dibistanan, tên çap kirin. Li deverên kurd lê pirin, di dibistanan de zimanê kurdî tê xwendin.

Li Rûsîya Federal jî li derdora 130.000-

www.arsivakurdi.org

150.000 kurd hene. Civakên kurdaye mezin li Moskva, Yaroslav, Novosîbîrsk, Karasnodar, St. Petersbûrg û deverên mayîn hene. Komele û navendên kurdan, kovar û rojnaman çap dikin, radîyoya "Dengê Rûsîya" rojê sihetekê programên bi zimanê kurdî (kurmancî û dimilî) belav dike.

Divêt em ji bîra nekin, wekî ew çalakîyên ku li dewletên Qazaxistanê, Azerbajanê, Rûsîya Federal û komarên mayîn pêk tên, bi giranîya xwe ve ji alîyê kurdên ji Ermenistanê derketî tên bi rê ve birin. Ezmûna kurdên Ermenistanê dema sovyêtîyê bi dest anîyî, hê jî kêrî parastina ziman û çanda kurdî tê.

Dema Sovyêtîyê sê navendên kurdnasîyê li Moskva, Lênîngrad û Yêrêvanê lêkolînên dîrok, ziman û çanda kurdî dikirin. Ji talebextan re niha tenê çend kurdnas wî karî didomînin. Li înstîtûta Rojhilatnasîyê ya St. Petersbûrgê (Lenîngrada berê) tenê sê kurdnas mane ku temenê hersêkan jî ser 70 salan re ye. Li Moskva û Yêrêvanê jî rewş baştir nîne.

Yekîtîya Sovyêtê bi ser kurdên wî welatî de hilweşîya, bi dehan (dibe ku sedan) hezaran bûne penaber. Îro civakên kurdan hêdîhêdî ser xwe de tên, lê hê jî pêşîya wan gelek asteng hene. Kurdên Yekîtîya Soyvêta berê ji bo parastina nasname, ziman û çanda netewî, hê jî pêwîstîya wan bi alîkarîya hukumata Kurdistana Fêdêral û rêxistinên dîaspora kurdan heye.

Çavkanî

1- Sours of the History of Azerbaijan, Baku, 1989, rû.68.

2- Dr. Khalil J. Raşow, Mîrgeha Şêxan û Şengal û Kilîs, Roj, 2003. Hanower, http:www.yezidi.net/mirgeh.htm, 21/Feb/2003.

3- History of Azerbaijan, Baku, 1994, rû. 283

4- Dîsan li wir.

5- G. Akhmedov, Srednevekovyi gorod Beligan, Baku, 1972, rû.82

6- Şamil Askerov, KurdişMedia.com, 18.09.2006.

7- www.ecmi.de/jemie/dowload/2-2007-Szakonyi.pdf, rû.4

8- Tosinê Reşîd, Êzdîyati, oleke hê jî ne naskiri, Stockholm, 'Roja Nû', rû. 224.

9- Poêma 'Sîranamê' ya yek ji mezintirîn şayîrê ermenîya yê sedsalîya XX, Hovanês Şîraz ser mêranîya wan hatîye sêwirandin.

10- Şaraf xan Bidlisi, Şarafname, Moskva, 1967, t. I, rû. 370.

11- V. Macharadze, 'Gruzinskiye dokumenti po istorigruzino-kurdsko-asiriysko-ruskix vzayimootnoşeni, 60-70 godax XVIII veka. Sabchota Sakartvelo, Tbilisi, 1989, rû.33.

12- http://www.armeniapedia.org/index.php?title=Kurds#column-one#column-one

13- Second report submited by Armenia pursuant to article 25, paragraph 1 of the framwork convention for the protection of national minoreties. 24,11.2006, rû.55.

www.arsivakurdi.org

14- www.eki.ee/books/redbook/kurds.ştml.
15- Tosinê Reşîd, rû. 183.
16- 'Sovetskaya Etnografiya', Moskva, 1964, N5, rû. 17-30.
17- Müller, D., The Kurds of Soviet Azerbaijan, 1920-91, Central Asian Survey, Vol. 19, No 1, 2000, p.62
18- Dîsan li wir.
19- N. Rzayev, www.kurdişmedia.com, 05, 06, 2006.
20- Farid Şafee, Inspired from abroad: The external Sources of Separatism in Azerbaijan. In the "Caucasian review of the International Affairs. Vol. 2(4)-Autumn 2008, p. 200-211.
21- http://www.unhcr.org/refworld/country,MRGL,AZE,4562cf2,49749bc,o.html
22- N.Rzayev, www.kurdişmedia.com, 05, 06, 2006.
23- Sovetskaya Etnografia, 1964, N5, rû.17-30.
24- Chaliand Gerard (ed.) A People Without Country: The Kurds and Kurdistan. New York: Olive Branch Press (1993-revised first American edition) pg.203.
25- Giga Chikhladze, Irakliy Chikhladze, "Grûzîya: kûrdskoyê mênşêstvo mojêt prosto îzçêznût" Tbilisi (IWPR) 16.09.2005.
26- Irakli Chkhladze and Giya Chikhladze, "The Yezidi Kurds and Assiriyans of Georgîya: The problem of Diasporas and integration into Contemproary Society: 21 Central Asia and Caucasus" (2003)
27- www.ecmi.de/jemie/download/2-2007-Skazoniyi.pdf.
28- Dîsan li wir.
29- www.caucaz.com, 20.12.2006.
30- Li parlamênta Komara Ermenistana serbixwe (18.05.1918-29.11.1920) nonerê êzdîya, Ûsiv begê Hesen axa hebû.
31- Gor malûmatîyên Dêpartamenta kêmenetewa û karên olî, ya hukumata Komara Ermenistan, îro li Ermenistanê dor 20 kurdên musulman mane.
32- http://oneworld.blogsome.com/2006/05/07/kurdiş-nationalizm-in-armenia/
33- Kurdiş Life, N 10, Spring, 1994.
34- 'Golos Armeni' nespaper (online edition) N139, 26.12.2005.
35- Yezidi/Kurds in Armenia, www.minelres@mailbox.riga.lv, 16.05.1999.
36- http://groong.usc.edu/orig/ok-19980611.html
37- http://groong.usc.edu/orig/ok-20040916.html
38- Hewar, sal 2, hejmar 21, 5 Hezîranê, sala 1933.

www.arsiyakurdi.org

DAYÎKA DELAL

Sewda ya te ya
Me bi hêviyên xwe meyandî
Bîrina te ya
Me bi agirê Newrozê kewandî
Dîroka te ya
Me bi xwîna keç û xortan xemilandî
Qelinê te wû ne bese?

Bav û kalên me
Li ser axa te kon vekirin
Keç û xortên me
Ji dest sewda ya te
Bi biskên te yên sor de
Xwe darde kirin

Ew çend sed salin
Keç û xortên te
Ji bo bigêhijin te
Li deşt û çîyan
Li hember dijmin
Çek di destan sîng vekirin
Dizanî Çend caran
Ava Dîclê û Feratê bi xwîna wana
Sor kirin

De bêje Dayê
Kêngê dest bidî me
Ne bese
Kêngê pêsîrên gewr
Dirêjkî devê me
Bese înat neke
Hê âzad nebûyî
Min bin ax neke.

MEM XELÎKAN - 2009

www.arsivakurdi.org

LI BERLINÊ KURDÊ BI NAVÊ RIZA BARAN NÎŞANA RÛMETÊ SITAND!

Roja 28ê Gulana 2009an, saet di 17.30 - 21.00an de, li navnîşana Jessnerstrasse 2 4-3 2, 10247an, li Berlinê di komcivîna ji aliyê Şaredarê Kreuzbergê Dr. Franz Schulz ve hat vekirî. Li pêşberî mêvanên hatin vexwendin, li ser jiyan û karên Riza Baran hate axaftin. Li gor agahiyên ku hatin dayîn Riza Baran wusa hate nasandinŞaredar di gotara xwe ya dirêj de wusa g o t:

- Gelo ji bo çi me ev xelata daye Birêz Riza Baran û Riza Baran kî ye? Riza Baran Kurdekî ji navçeya Anadoliyê li bajarê Kirsehîrê di sala 1942an de, li gundê





Tavira hatiyê dinê. Dibistana seretayî, navîn û heya lisê li Kirsehîrê xwendiye. Cara yekem di sala 1963an de, ji bo xwendina xwe ya bilind hatiye Elmanyê. Li Hannover û Berlinê zanîngeha teknikê qedandiye û bûye mihendîz. Lê wî li ser ew karê xwe nexebitiye û berdewam nekirye. Li Berlinê cara yekem ji bo xortên bîyanî dest bi mamostetiyê kirye û di aliyê din de, di Sendiqata Mamosteyên Elmanyê liqê Berlinê kar kirye û pirî salan serokatiya mamosteyên bîyanî kirye. Di vê navbeynê de jî, cara yekem li dervayî welat di damezrandina Federasyona Komelên



Karkerên Kurdistanê de ciyê xwe girtiye û berpirsyariya Komela Karkerên Kurdistan Li Berlinê jî dayê ser mile xwe.

Ew di nav Kurdan de cara yekem bû ku hatibû dervayî welat de jî ciyê xwe digire û wek siyasetmedar têye nasîn. Dema Partiya Keskan di sala 1978an de li Elmanyê sazbû; ew bû endamê vê partiye û heya îro jî endametiya xwe her berdewam dike. Ji sala 1995an heya 1999an di nav Partiya Keskên Elman de li Berlin/Kreuzbergê parlamenter hatiye hilbijartin û ketiye Parlamena Eyaleta Berlinê. Di nav komele û saziyên bîyaniyan ên li Berlinê de bi kar û barên xwe Bbrêz Riza Baran gelek baş têye nasîn.

Bes di nav karên wî yên hêja de ya me bêtir kêfxwes dike, ew e, ku Riza Baran di navbeynê salên 2001 heya 2006an di şaredariya Kreuzbergê de serokatiya meclîsa bajêr jî kir. Wî bi ew kar û bar û çalakiyên xwe yên civakî, xelata em îro didin wî, wî ew zû ve heq kiriye. Lê ez, wê niha li pêşberî we didim birêz Riza Baran û wî bi dil û can pîroz dikim. Ji wî re jiyaneke rêj, tenduristiyeke baş dixwazim. Bila ew her dem bi rûmet û bextewar bijît!"

Piştî axaftina serok Dr. Schulz, wî ew gazî kursî kir û xelata wî dayê. Birêz Riza Baran bi axaftineke kurt spas kir. Paşê ji aliyê mêvanan ve ew hate pîroz kirin. Ji bo vê pîrozbahiyê ji aliyê şaredariyê ve şeveke çandî bi xwarin û vexwarinê heya dawiyê berdewam kir.

A. Balî

Berlin / 2 8.05.2009

www.arsivakurd.org

PEZBIR

Fatê Hecî bangê bûkên xwe, Mircê Hecê û Eşê Ninê kir û got; da rawin, ro hatîyê nivro. Hun ê kîngê dest bi kar û barên xwe bikin? Rabin! Wan kurikana aş bikin! Pirşungekê û helîsekê pir bi ser êrdin. Bangê Hesî Totê, Mexmî Yêxip û Osî Yexip kin. Ma heri biringên tûj bi xwe re bînîn eger haribiringên xwe ne yê tûj in, ma bisûn. Bîrmekin, vê re bên, ma sênexen jî bi xwe re hunin..

Berbangî ye. Ji axê ku hênikîyê şevê şil kirî ye, bîna nanî teze û bînê bereketê dihat. Hewayê pak wek şirî ku parzûn kiri bû. Bîneke teze ji roja nû dihet.

*

Hesî Mamê, xewê xwe ji şevinê bi şûnda nehat. Xwe kire nev kulevî xwe û pişta xwe da sêmer, cixareke pêca û keta nav ramanan. Virda û wêda seresibê bi zorê li xwe kir. Bangê dajoyê xwe Misto kir û got; da reba! Kerî xwe bar ka, giran û giran bi rê kevê! Ma tu bi pozî rojê re li gund bî. Misto kerê xwe bar kir û çû ba Hesê.

Hesê got; herê vî kavirî ku ma duh, ji nanê pêzbire re helbijartî bigre û hûne. Giran here! Pêz ramake. Misto keta nav pêz û kavir girt û ji Hesê re hanî. Kavir, berxê salê cunê bû. Devreş û dûvî xwe yî wek kevirî destarekî bû.

Misto li kerê siwar bû. Misto sîwar bû bi şûn de, Hesê kavir da ber Misto û lingên kavir li bin zikî kerê girê dan. Misto kete ser rê. Di dawîyê cîyayî inê gewr re dekat ser baxî Heskî Omer.

Ji alîyê bêx de bîna şelekên û cêmî bîrê Husî Canê xweş û xweş dihat. Xaniyên ser negirtî hing wang dawestine. Eger av, ji bîra ku kolan derkete, belki îro li vir zozanek habûya. Ji bo ku av derneket jîyan ji li vir dewlement nebû.

Li dawîyê gund Misto, rastî çend jinên ku berva fêzan diçûn hat. Yêkê ji wanan, ji Misto pirskir; Kix heyê? Kix pire?. Jinan persive Misto nepan û berva fêzan dana rê.

Misto wexte ku gehiştê ber Malê Herşid, kerê xwe dawestand û bang kir. Hêmîtî Mistafê lawê Fatê Hecî ji hundirî malê derket û çu ba Misto. Kavir ji ser kere dîna û berve aşxanê bir. Dema ku Mistafê kavir dit, di ber xwe da kire pilta û pilt. Got çi eceb e?

*

Penc û şaş keriyên din jî di newala Pîrîkê de, di fêzan da bûn. Hesê doralîye xwe nêrî. Şivan, henê hing rekatine û Îsmealî Malê Hesî Qedê, Mastê Elê Simo û Eli Hecî Oxcî yê li jor fêzan rûniştine cixare dikşînine. Mestî Elê Simo bang kir; Hesê! Wa çi telaşeyê? ma te dîsa bîra gund kiribe. Were cixareke xwe pipêçe.

www.arsivakurdi.org

Her çiqas şivanan ji hevdu pêz didizîn û yekcaran bi hevdu re şer dikirin xeresê jî, mafkeyên xwe baş bûn. Çimkî, ew ê li çolê hewciyê hevdu bûn.

*

Hesî Mamê demeke kin, li herdê Mestê û wanan dawastî û cixare xwe qedand bi şun da vegerî. Kerî ji fêzê nalê pîrikê giran û giran rakir û hemêle cîyayî beşaxile kir.

Fêzên Nalê (Newal) Pîrikê, di tirejekê ku lêh kûr kirî da bûn û havînî wek fêz dihat bikaranîn.

Hewayê hênik bû. Hesê ji bo wê jî kulevê xwe yî hîn li nav milan bû. Li her pîstekî kulev rojeke bi tirêj nekiş kiri bû*. Demekê ki bi şûn de beriyê kêrî cexe zîwên kir û li kerê xwe sîwar bû ku here ba Hecîyê Musê. Hes her sibekê ji biharê virda, diçû ba hecî Musê û teva hevdû xurinî dixwarin.

Hecî Musê kerîyê xwe, kerîyê mihen bi şîr bû. Hecê dît ku Hesî bervê tê, zanî ku ew sawê ci tê. Hecê mîheke bi şir girt û dut. Biroş heta nivî tiji şîr kir û bulxirê ku ji ber şivê duh mayî, avite nav şir û Hês pa.

Hêsê silavê xwe da û xwe da ser kulevî Hecê.

Bi novê şir danan ser xwe. Hecê tabaxe xwe derxist û da ber Hesê. Hesê cixareke okkalî pêca.

– Ê Hesê hûnê demekê ji xwe re kêf bikin. Ji xwe re, kavire berdin ziwên û bendê bipên.

– Va qirarê salekê ye, em ê li colê ne. Ma zivistan li hewşoyî beşaxila derbas kir. Zivisteneke sar û bi berf. Imrê me di bin kulev û li ser erdî hişk de çû. Na, heqî ma jî heq be!..

Gur xêr bi me nedikir. Kûçikên me eger ne yê şer bûna, me kavir giştikê bi gur dana.

Ji civatê, sohbeten û ji zar û zecên xwe dûr, îsal cêre pir bû, her kavirek bû ga kî. Îna bike ku, endi quweta me nedigehiştê, em caxkinî.

Ji mal û hevalan dûrbûnî ne tiştekî ku însan lê bi hawesî bike.

– Kesî ku pê re dengkî tune. Çend salan berê, sê û çar malan din jî, pezî xwe zivistanî li Hewşoyî Beşaxile bi xwedî dikirin. Hewşoyê Beşaxile wek zozanekê dibû. Her şev li hewşokî digêheştini hevdû û ken û henekê li navê bûn.

Hewşoyê Malê Utê, Male Mihî Reşê, Malê Elê Birê û malê Hacbekir. Îsal boş bûn.

Dunê bi insanan şîrine û dewlemend e. Hesê cixera xwe teva kir û got; wextînan kavira pevim, ma di ber birê tenekê xu bidin. Çiqas xudan ê wiqas hêsan werin birînê. Xatirê xwe xwest. Hes sîwar bû û kavir dan ber xwe û berve kaniye malê Hecê kete rê.

Avê kaniyê malê Hecê şor e, hêywanên pir jê hez dikin. Hesê pez av da bi şûn ve berva mala Mistefayî Malê Herşîd kete rê.

*

Mêvanên ku ji bo xêrkirinê pezbirinê hatine yê li ser balifan rûniştine û piştên xwe yê

www.arsivakurdi.org

dana diwarî xaniyê Hecî Malê Herşîd.

Mixtarî gund, Hemê Hecî Elê, yî him çayê xwe vedixwe û him jî qala xwedîkirina pêz dike.

– Heyfê pêz! Heywanekî qutsî ye. Li ser çermî wanan ayêtên kitêbên qutsî hatine nivisandin. Jîyana me, va bi hezar salan ku pezî bi xwedî dike.

– Şivanî zenêatê pêyxambera ye. Hz. Musa û Hz. Îbrahîm şivanên jêhatî bûn.

Gotinên Hemê, Mamî Zexê Elê Ewê (Mamî Qolo) bi serî xwe testiq dikir.

– Ji kirasî me da bigre heta gora, şal, xali, baliv, lehêf, doşek, kulav, mast, rûn, goşt, post, çerm û germkirina malên me, hîn jî li ser pêz e.

– Herroj qîmeta pêz ê dikevê. Herîyê berê, serbiser pere dikir. Nuha jî dukanê bêdil distînine.

– Di guna Osmanîyan de, kerîyê nêr, heta Samûlê cêre bi cêre dibirin. Revitîyeke bi zehmet bû. Bi mehan dewam dikir. Zikekî têr û yekî birçî bû. Li welatên dûr li welatên xerîb emniyetawan insanan tunebû. Li rê, gelek tişt dihat serê xwedanî pêz û şivanan. Hecîyê Gulê, bavê Fatê Hecî û Îdkî Eşê Asîyê li Yalovê wexte ku keriyê xwe dibere Stamolê, ji aliyê haydutên arnavut ve, bi du şivanên xwe ve hate kuştin.

Hesenê Malê Mircê silavê xwe da û xwe da kelekê Yêxipî Elê Qutê. Mistefê Malê Herşîd tebaxê xwe cixelê direjê Hesen kir û got; çayê ji Hesen re anîn. Hemî Hecî Elê, silav da Hesen bi şûn de dengkirina xwe berdewam kir.– Nuha jî kamyon û ewrûpayê bûyê moda. Ki ji male xwe radibe, dibê; ez herim Alemên an jî kamyonekê xwe bistînim. Milhesenî min jî israr dike, dibê; ez illahî herim Alemên.

Bêgûman, vê pêşvacûnê kes nekanê dawestine. Lê hertişt bi lez dibê. Xwedê soniyê me hunê xêrê!...

*

Wexta ku pez dihat birinê, kurikên li doralîyê cîhê ku pez tê birînê dicivin. Piranî ji wanan law bûn. Keçik pir kêm dihatin. Heri berhevkirin ji keçikan re eyîp bû. Ber gomên ku kavir tê da, dibûn, ciyên çetên lawika. Lawik qor bi qor kom dibûn.

Hemoyî Mokê seroktiya kurikên mehelê xwe dikir. Hejmarên wanan, gelek pir bûn.

Hemoyî, ji bo ku pir herîyê top kin, taktîkan dida çetî xwe. Hevalên xwe tema dike ku; ma ew lawên mehelên din nêzîkî gomê nekin. Hamo, bi endemên çêtê xwe re digot; eger, we baş kar kir, ez ê her yekî ji we kevirkonikekî (kevkanik) bidim.

*

Du çerçicîyan, erebên xwe yên hespan li cihê gomê dawestandi bûn. Muj, leblebîyê ser bi şekir, şekirî lemunî, nenik û şe difirtin.

*

Jinan kavirê ku ji bo mêvanan û şivanan hatî serjêkirin ji hevdu derxistin û dana ser agirî kerman.

Jinan xirarên ku, heriyê ji bo ihtiyacên

www.arsivakurdi.org

malê tekîn, ji nav ser derxistin û birin gomê. Dema ku Mistafayî Malê Herşid xirar, di dest jinan da ditîn, bi çolê ket.

– Çirki ne!

– Malê li min bişewtinine!

– Herîyê zaten pere nekêye. ***Min li kerî şêytên siwar mekin***. We bi xwe dît. Zivistanî, em şerpeze bûn. ***Pere ketibûn sûrîyê kera.***

Jinan deng nekir û bi yê xwe kirin.

*

Şivanan dest bi bire kir. Her şivanakî kevirekî reş girt û ling girê dan.

Her malekê deh panzdeh kavir anjî mîhên reş, ji bo herîyê reş, bi xwedî dikirin.

Herîyê reş ji bo senex, kulavên şivanan û ji bo kulavên rexistinê, ji bo gora, dolaxa, şalên ji herîyê reş û ji bo tevnê lazim dibûn.

Yaxibî Elîfê kavireki reş û çê girt û ling girê dan. Destê xwe avita nav herîyê û got; rind xudaye, ê bêzahmet were birîne. Osî Yêxip, kavirê xwe zû birî û heri avite ber Mistafayî Male Herşid. Mistefê, ji berîya xwe 10 keyme derxistin û da ser heriyê.

Şivanan du heriyên kavirên cê, şandin dukanê Husinî Qutê. Husîn parzing tiji lokum biskiwît û şekir fistik kir û da dest Mickî Malê Hacê.

*

Pezbir, heta nîvro bi şûn de berdewam kir. Dema ku bir qediya, şivanan dest û pîye xwe sûştin û derbas hundir bûn. Ji bo ku



însan têhelên, li du oda sifre dagirtin. Li ser tawaxê, nanê ser sêle rêxistin û pilav li ser kirin. Duyê kavir, dane ser pîlavê û goşt dinan kelekê pîlavê û meşrefê tijî dew gerandin.

Li her du oda jî yî enî bi sal, dest pi xwarinê kir bi şûn de yên din jî li gor salên xwe kevçiyê xwe di şorbê mayrê re kirin.

Pirşung: Şorba ku serîsibê kewanîya li malê re dikeland. Pirşung ji êrd, rûn û ji nîskên hêşin ve dihat çêkirin.

Helîse: Helîse jî pirşunga bi mit bû!

Kix: Bişqolên pêz in. Dema nan lêdixistin wek ardu dihat bi karanîn. Li zivistanan jî di zovan da vêdixistin.

Kulav wêne

Kulevên rêxistinê. Ji herîyê hatiyê cekirin. Kulevên wang, edî meri zor dibînê.

Ew rojên li pîstî kulêv, xwedê Mitra temsil dikine. Mîtra, berî îslam Xwedê kurdan bû. Mîtra xwedayê rojê, şev û jîyanê bû. Ew, mergan diparêze, avan diherikîne, baranê dibarîne, parastina şivanan û dewaran dike.

www.arsivakurdi.org

Arlanda– Stockholm

Bi Elî Ciftci ve, em bergindê Ayşe Gul Kisabacak û Nuhî Hecê çûn. Berî ku em herin me Dr. Hatice Polat û Yusuf Polat li ser derîyê xwe, li malê Eli bi cih hiştin û em derketin ser rê.

Ma dêh li erebê kir. Elî, cavan li serî erebê derxê an jî bin min wang dihat.

Navbara min û erebê pir tune.

Bihar e. Şev nîvê şevê. Xema kê xewa. Em ê hecanli û xenê ne. Hevalên ji Almanyayê ji bo konferens û şeva Bîrnebûnê werin.

Bihar e û şevên Swêdê ronî ne. Şêvên bermurad in. Zindîyê li hevalan digire.

Dema ku me tekê erebê vedikir ji darên ku herdu keviyên rê dixemilîni ne dengên çûçikan dihatin. Çûçikên ku li heval û hogira digerin. Dengên çûçikên xwestak û demhatî yê pêl û pêl li ezmanan belav dibin. Şevên sipî ne.

Bihar e. Însên nakine xewê.

Kefê me li şunê ye. Em kilaman dibêjin. Min kilama Êmê Hemê got û hekata wê ku min di festivala gelên dunê yên kevn de stiraye ji Elî re behs kir. Civîn û festîvalên xelkên dunê yê herî kevn ku li Karesuando, li Bakûrê Swêdê di sala 1979 da bûyî kir.

*

Hevalên Sam, dema ku em ê li Stockholmê, li cihê Sergelstorg di greva bircîbûnê de bûn (sal 1978), em naskirin û em dawetê festivalê kiri bûn. Ji bo protestoya bûyerên Maraşê, em ketibûn grevê.

– Em çûn Karesuando ku mehşer e. Hevalên Sam, xelkên binecî (yerli) ji welatên din jî dawet kiri bûn. Ji Sovyeta, ji Amerika û ji Kanada. Ji Amerika û kanadê, Îndîyan hatibûn. Ji Sovyeta jî Sam. Dema şerê sar e. Sovyet û Amerika ê hevdû biwxune. Sovyet û Amerika yê di musabaqe ke bi xwin û xuda ne.

Ji bo ku imkan û kuwetên xwe nişan bidin, her dewletekê bi barî kamyonan enstruman û dezge bi here hunî bûn. Her kafileke wanan, 50 an jî 60 kes bûn.

Em jî bi navê *Komala Karkerên Kurdistanê li Swêdê* çûn karasuando. Em boydax çûn. Ne enstrumenekî me habû ne jî dengbêj. Em sê reben. Lê, li nav gelê samîyan de, ji kurdan re sêmpatîyê ke mezin habû. Wanan dixwestin, em jî xwe bidin naskirin û derdên xelkî xwe ji dûnê re nîşan bidin.

Hevalên sam ji ma aktivitên ma pirsîn. Ma got; em bêhezirî hatin. Çimkî hevalên ku werin karên xwe derketin û kesên ku bi lez şûnê wanan bigrin û amadê bibin jî ma peyda nekir. Halbûkî, kesî me yî ku wê wextê kilama bê an jî li enstrumenekî lêxe tune bû.

Min got; ez ê kilaman bibêjim. Ez derketim ser sahnê û min destê xwe yî rastê da bin guhê xwe û hayê Emê Hamê kir.

Goç bi rê ket
Goç bi rê ket
Em xemilî bi rahêle dê ket ...

Bi kilamekê, me ji grupên din pirtir, çepik û sempatî topkir.

www.arsivakurdi.org



Sefi, Bilal û keç û lawê indian.

Dema ku em gehiştini Arlandê, ez bi lez, ji erebê dêhatim û berve derî ku heval jê derkevin meşim û Elî jî heta hîngê ereba perk dikir.

Min li tabloyê demhatin ên tayerên nîşan dida mêze kir ku teyara hevalan hîng dênehatîye. Min nefese ke xe yê kûr heyne û hatima xwe.

Min carake din li tablo mêze kir. Ki yê li tablo nişan dida ku tayera Erbilê li seat 11.55 dêhatiye.

Hecanakê ez li berhevdû dinam. Min xwe şaş kir. Ji xwedê Elî cîlê, li kelekê min pêyda bû. Min tablo nişanê Elî da û bi Elî re got: kek Elî, ez rast dibînim, bi min weng tê an jî Erbîl bajare kî welatên dinê?

Elî demekê li tablo nêrî bi şûn da insanên ku ji gumrikê derdikêtî bi mi nimandin û got; guh xwe bi serde û li kincên wanan binêre! Rast, wan insanine bi kurmanci û sorani dengdikir û şal û şapik li xwe kiri bûn. Elî, bi çavênşil li min mezekir û got; Min ve roja jî dît! Min ve roja jî dît!

Halbûkî Elî, çend salan ber vê ji Arlandayê çûbû Başurê Kurdistanê lê dîsa jî hecanê pê girt.

Ma tabloyê demhatina teyaran nişanan hevalan dan û ew jî pir bê xenê bûn. Li tabloyê demhatina tayaran bajarên wek Paris, Frankfurt, London û Roma jî habûn.

*

Nuhî Hecê ji derî gumrikê mina şewkekê derket. Karî ku dikê ne harcê herkesekî ye. Wan karanan, karên zaningahên ku bi destî dewlêtan finansê dibin e.

Ma heval heynan û li erebê sîwar bûn û çûnî mala me. Bi rê da axaftine me ê bes li ser Erbîlê û Kurdistana başur bû. Şeva me xweş, bi Erbilê heta xemilandin.

Seyfi Dogan

www.arsivakurdi.org

Deştê Lykaonia herema Axylonê û gundê Drya

Deştê Lykaonia herema Axylonê û gundê Drya.

Eger yekî, hezar salî ber vê namêk ji Xelika re bişanda adresa wek jor binivisanda.

Ez bûme mêvanê festivale Xelika. Bi hezaran insan, keç, law, bukên teze, kal û pir.

Ji her welatî dunê insanên xelika habûn. Ji Swêd, Alemên, Kanada, Avusturya, Finlandiya, Holandê, Fransê, û welaten din. Însanên Xelika bune yek, ketin destî hevdû, gowend kişandin, kilam gotin û hevdû naskirin.

Bawer dikim ku armanca festivalê yek jî ew e ku insanên me binê ba hevdû.

Cimkî îro insanên me li her welatekî dûnê belabûne û ji çand(kultur) örf û adetên xwe dûr dijinêne. Piranîyê cîvanên ku li festivalê başdar bûyî, ji derve welat hatibûn an jî li derve yî hati bûn dûnê. Gerek armanca festivalê van cîvanana bi mirascandiyê xwe û kokên xwe re hûne ba hevdû. Ew kokên xwe nasbikin. Bi xwudîyê nasnameke domdar bibin.

Sergî(pêşengeh) yê wênan û tiştên kevn û berhemên Filiz Ateş û hevalên



we bi rast ramanên hêja bûn. (ji bo wê jî henek peşniyarên min hene. Ez de wanan li dawiyê nivisê rêz kim).

Helbijartine cihê ferstivale bi rast serkeftineke bi serî xwe bû. Cîhekî fera, cîhekî ku navî deştê Konyê teyid dike, cîhekî deşt û wekî text û li kanîyê jêri û li ser cîmen. Da werê baxtiyar mebê!

Li festivalê, atmosfereke germê ku li Xelika dihat habû. Herkeskî rehat, azad û bi xwebewar herekat dikir. Li cihên fera li ser cim keç û lawan qor bi qor gowend dikşandin û henan jî li peşangehe Filiz Ateş û hevalên we dinerîn.

Li festivalê min ruhê xelikayî ku xwe zû û zû nîşan nada dît. Ruhekî demokrat, xwebawar, neyî xag, azad û serxwebûn.

Ruhekekî li berxwedide. Ruhekî ku ji heqê neqekîyê derketî û derdikeve û

www.arsivakurd.org



hakîmê rewzê xwe. Ruhekekî bawarêyê xwe bi hes û aqile heyî. Ruhekekî ronakbîrîyê xwe bi înad. Ruhekî ku ronakbîrîyê xwe mitewazî. Ruheke kî cesaretê xwe li zemên belavkirî.

Meri dikanê rêngdaran zêda bike lê, ez li wir dawestim. Tabiî hatina vê merhelê bi kar, zehmet û bi xuyê hanîyê bû. Bi hendikîyê nebû. *Nêynika meri berhemên xwe ne. Şorê tu hêjayiyên xwe tune!* Ronahîyê rojê mêla min kişand. Ronahîyêke germ û nerm. Ronahiyêke ku hundirî insanan ferah dikir û intensiv û li ber çavan. Ronahîyêke nêzik mina hevalakî, reynê dest, di govendê keve anjî tevhevdû bigere. Di berîyê xwe ke. Ronahîyêke intensiv û amade.

Kemasîyeke festivalê pir girîng habû– Pakijî. Bi rast, ew dîmêne li Xelika ne dihat. Ne Xelika, li tu derên nedihat. Cihê ku festival lê pêkhatî, keskî bi şuret, di bin qelêre da cihîşti bûn. Gercî belediyê pakiş kir, lê cima ma kulturê pakişiyê peşda nebirîyê. Cima em tiştên ji bermayî yanê çopê xwe li cihên xwe cîhtilinî an jî di ser serî xwe re niştikinî. Çima em hîng wek goçberan hereket dikinî. Cima hundirî malên mê pakiş doralîyê malên me qelerî û gemarî. Cima ey gelo!

Komitê festivalê karakî baş kiri bû û li deme festivale ji ew karê berdewam kirin. Mala wanan ava be. Pir roja bibînin.

Mem Xelîkan, heta dawiyê festivalê ji bo ku kemesîyêk cênebe li berxwedi-

www.arsivakurd.org



da û ji derekê dimeşî derekê. Fotograf dikşandin. Cîvanên di komitê da pê didanişîn.

Mêvanên ku hatî, bi rehat dikirin û ji wanan re kala festivale û gund dikir.

Navarokê festivalê qelav bû lê meri dikane hîn jî dewlement bike.

1– Rojê festivalê, serî sibê, pakişiyeke li nav gund tertip bikin. Hemî gundî tevê bibin.

2– Ji pakijîyê bi şun da, Li cîhên ku ji alîyê beledîyê da hatîyê tespit kirin da dara danîn.

3– Li cihê festivalê konekî reş dagrin û hundirî kon bixemilînin.

4– Agirekî sîn sînê dadin

5– Aksesuwarê şivên peşkeşkin

6– Beranan arang kin

7– Bîdonên çopê li cîh festivalê bi cîh bikin.

***Hereme ku eşîrê Xelikê(xelika jor) konî xwe li ser vekirî yê, di gunê yûnanîye re bi re digotin Axylon. Mana wê cihê bêdar e.

Cîhê ku gundî Xelika li ser ava bûyî navê xwe yî bi yunanî Drya bû.

Bi yunanî mana Drya, Darberû yê (bi tirki meşe ağaci).

Di mitolojiyê yûnanîye da Dryad henê.

Dryad pêriyên dara ne.

Dryada daristan ji talûke û sawitandinê diparêstin.

Sifatî Dryade bi şeklê jinanan tê tasvîr kirin.

Cimkî jin Xwedayên bereketê ne.

Seyfi Dogan

www.arsivakurd.org

Kurd û pirsa zimanê standard

Mueyed Teyib

Li seranserî cîhanê nêzîkî 6000 ziman hene. 50% ji van zimanan ji layê 10.000 û kêmtiran dihêne bi kar înan û gelek ji wan ber bi nemanê ve diçin. Ji hemû zimanên cîhanê jî bi tenê 5%-ê xwendin û nivîsîn pê dihête kirin, anku nêzîkî 300 zimanan. Ji van 300 zimanan jî - herçend çi hejmar li ber destê min nînin- lê ne pitir ji 100 zimanan hene ku berî pitir ji 500 salan xwendin û nivîsîn pê hatiye kirin. Zimanê îngilîzî yê ku evro li seranserî cîhanê bi kar dihêt berî 500 salan pê hatiye nivîsîn, zimanekê wekî zimanê rûsî bi tenê berî 400 salan bûye zimanê nivîsînê.

Zimanê kurdî

Zimanê kurdî bi hemû zarava û devokên xwe ve, zimanê neteweya kurd e û vî zimanî rolekê mezin di parastina nasnameya kurdî de gêraye û herdem sengerekê sext bûye li hemberî hemû hêriş û pêkolên bihujandin û asîmîlasyonê û wek çiyayên Kurdistanê, xwe û hebûna neteweya kurd jî parastiye û bi dirêjahiya dîrokê zimanê xem û xewn û hîviyên me bûye û şakarên bilind pê hatine nivîsîn. Di dîroka her zimanekî da, roja nivîsîn bi wî zimanî hatiye kirin, rojeka geş û dîrokî ye û wek werçerxaneka mezin dihête hijmartin.



Kengî nivîsîn bi zimanê kurdî hatiye kirin?

Derbarey Baba Tahirê Hemedanî heta evro jî bigirûvekêşk heye ka aya zimanê çarîneyên wî yên ku piştî çarsed salan ji mirina wî hatine nivîsîn, zaravayeka farisî ye yan zimanekê serbixwe ye yan jî yek ji zaravayên kurdî ye û li ser vê pirsê dîtinên cuda cuda hene. Di dûv Baba Tahirê Hemedanî de kî dihêt ku bi zimanê kurdî nivîsiye û çi guman li ser kurdîbûna zimanê wî nîne?

Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnameyê de navê şaîrekê kurd diîne ku 100 salan pêş Melayê Cizîrî jiyaye û navê wî »Mîr Ye'iqubê Zerqî« bû û xelkê mêrdînê bû û

www.arsivakurd.org

dibêje ku wî dîwaneka şîirên kurdî hebû û şîirên wî îşirên dînî bûn û di nav xelkî da gelek belav bûn. Lê mixabin heta evroke jî çi şîirên wî negehiştine me û ji ber hindê destpêka nivîsînê bi zimanê kurdî vedigerîte serdemê Cizîrî û Feqiyê Teyran, berî nêzîkî 500 salan. Bi gotineka dî zimanê kurdî û Îngilîziya modern bi hev re bûne zimanên nivîsînê û kurdî 100 salan berî zimanê rûsî bûye zimanê nivîsînê.

Lê ji ber ku kurd ne xudan dewleteka neteweyî ya serbixwe bûne û senterekê wan yê desthilatê nebûye, ew zimanê Cizîrî pê nivîsî nebû zimanê hemû neteweya kurd û di dûv de û her çend demekê gelek dirêj jî vekêşa. Nivîsînê bi zarav û carna devokên dî yên kurdî jî dest pê kir û eve kurd bûne netewe û heta evroke take zimanê standard nebûye, bi wateya »ew zimanê seranserî yê neteweyek pê dixwîne, pê dinivîse, têdigehe û di karûbarên fermî da bi kar diîne« û evroke jî wekî berê pitir ji zaravayekê di nivîsîna edebiyat, karûbarên fermî û xwendin û nivîsînê de bi kar dihêt û ji hemûwan pitir jî kurmanciya jorî û jêrî ne ku di hemû navgînên ragihandinê de »radyo, televîzyon, rojname û kovar û htd.« bi kar dihên û li herêma Kurdistana Îraqê bi herduwan jî xwendin û nivîsîn li xwendingehên fermî pê dihête kirin û di nivîsarên fermî û mîrî de jî bi kar dihên, her çend kirmanciya jşrî pitir bi kar dihêt ji ber ku ew zûtir ji kurmanciya jorî bûye zimanê xwendingehê û hejmara pêaxêvan jî pitir e ji hejmara pêaxêvên kirmanciya jorî li Kurdistana Îraqê.

Lê nebûna take zimanekê standard bi dirêjahiya dîroka nû ya neteweya kurd çi car nebûye egera ku her hemû kurd bi zarava û dîn û mezhebên xwe yên cuda cuda jî ve hest neken ku her hemû kurd in û her hemûwan jî yek dîrok û yek çarenivîs heye. Ne tenê eve belku tenanet ew kurdên zimanê xwe jî ji bîr kirine xwe her bi kurd zanîne û wan di rêka serfirazi-ya kurd û Kurdistanê de canê xwe pêşkêş kiriye û evro bi dehan hezaran kurd hene ku pitir ji 200 salane ew ji Kurdistanê dûr bûne û wan zimanê xwe ji bîr kiriye, wek kurdên Urdunê, Sûdanê, Şamê û gelek cihên dî, lê ew dîsa jî xwe bi kurd dizanin û dilê wan bi serkeftinên Kurdistanê şad û bi karesatên wê jî birîndar dibe.

Kewate tiştê ku behdîniyekî, hewramiyekî, feyliyekî, sineyiyekî û soraniyekî û zazayiyekî û kurdekê şîî û sinî û êzidî û kakeyî û elewiyekî bi pêk ve girê dide ne zimanê standard e. Belku hest e û wekî çawa wî hestî bi dirêjahiya dîrokê yekîtiya neteweyî ya kurd parastiye her ew hest jî dê wê yekîtiyê di paşerojê de jî parêze û eger em xemxwerên wê yekîtiyê ne diviya em kar ji bo bihêzkirina wî hestî bikin, ne lawazkirina wî wekî hindek kes di danûstandin û nivîsînên xwe de derbarey zimanê standard dikin.

Ev danûstandina germ û gur ya ku evro li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê li ser zimanê standard yan jî bi navê zimanê standard dihête kirin ne tiştekê nû ye û reh û

www.arsivakurdi.org

rêşalên wê vedigerine berî pitir ji 60 salan. Lê tiştê nû û xeter ew e ku çi cara wekî evroke ev babet bi vî şêweyê nizim, kirêt, tund û tîj û demargîr nehatiye gengeşe kirin. Mixabin yên agirê vê gengeşeya ku bêhna fintneyê jê difire xweş dikin ne xelkekê nezan û asayî ne belku ew rojnamevan, nivîser û rewşenbîr in. Lê xweşbextane heta nuke siyasiyan xwe dûr ragirtiye û ew bi aşkerayî beşdar nebûne, eger ne, bi rastî jî da akamên gelek tirsinak hêne pêş.

Di gengeşeya zimanê standard da evro dû araste hene:

1. Arasteya sepandina zaravaya kurmanciya jêrî wek take zimanê standard û erşîfkirina hemû zaravayên dî. Pîçekê zelaltir rê li kirmanciya jorî girtin ku li xwendingehan bête xwendin û di nivîsarên fermî da bête bikarînan û di vî warî da gelek cihên fermî, wek zankoyan û wezaretan, bê ku biryarek jî hebe, ev çend bi cih înaye û ji bo şagirdekê kurdê kurmancîaxêv çênabe ew bi kurmanciya xwe nameya xwe ya masterê yan diktorayê li zankoya Hewlêrê binivîse lê di eynî demî de şagirdekê Hewlêrê yan Silêmaniyê azad e nameya xwe bi kurmanciya jêrî pêkêşî zankoya Dihokê bike.

Kewate hinek layenan briyara xwe daye û di praktîkê de jî pê dikin. Ev araste ye her çend bangeşeya hebûna pitir ji zimanekê standard wek gefekê li ser yekîtiya neteweyî ya kurd dibîne û eve aşkeratirîn ergumentê wê ye. Lê mirov di gotin û nivîsînên gelek ji piştevanên vê arasteyê de risteyên weha dibîne: »Me çi ji parçeyên dî yên Kurdistanê nîne û di vê pirsê de diviya em rewş û kawdanên herêma Kurdistana Îraqê bi tenê li ber çav bigirin« yan »Li Kurdistana Tirkiyeyê 85% ji kurdan bi kurdî naaxivin!« yan »Li sûriye û Tirkiyeyê zimanê kurdî neşêt bergiriya zimanê tirkî û erebî bike« û gelek gotinên dî yên hemû sinor derbaz kirîn û ne hêjayî hindê ne em wan berçav bikin.

Ez bi xwe nizanim çawa mirovekê xemxwer li ser yekîtiya neteweyî ya kurdî dişêt bêje ku kurd li Tirkiye û Sûriyeyê ber bi nemanê ve çûne û diçin, di demekî de tirk bi xwe vê dawiyê danê bi hebûna kurdan didin û çend gavek jî ji bo rewa bikarînana kurdiyê li Tirkiyeyê havêtine

Tiştê herî balkêş li dev alîgirên vê arasteyê ew e ku piraniya reha ji wan, eger nebêjim her hemû, dixwazin zaravaya wan bibe take zimanê standard û ew di gengeşeya xwe de jî -ne hemû lê gelek ji wan- gelek tund û tîj û demargîr in û ew her dîtineka muxalif bi dîtineka »herêmçî«, »diyalektbaz« û carna bi »caş« jî tawanbar dikin û piraniya wan jî nivîser û rojnamevan in û akademiyên bispor di warê zimanzaniyê de di nav wan de kêm in.

2. Arasteya pitir ji zimanekê standard. Layengirên vê arasteyê ji kurdên xudan zaravayên cuda cuda ne û mirov di nav wan da mehabadî, sineyî, feylî, hewlêrî, silêmanî, zazayî û htd. dibîne, lê piraniya reha ji wan kurdên kurmancî jor in ji ber ku ew pitir in û ev babate jî pitir ji wan digire.

www.arsivakurdi.org

Ev arasteye hebûna pitir ji standardekî bi encamekê siruştî yê dîrok û cografyaya Kurdistanê dibîne û ew sepandina zaravayekê û rêgirtin li ber zaravayên dî bi karekê entîdemokrat û dijî prensîpên mafên mirovî dihejmêre û bicihanîna biryareka weha bê dijberiyeka berfereh nabe û hîngê diviya hikûmeta herêma Kurdistanê pena bibe ber zebr û zengê û ev jî ne di gel siruştê hikûmeta Kurdistan digunce û ne jî di desthilata wê dea dibe. Û serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê ji hindê hekîmtir û dûrbîntir e bikeve di şaşiyeka weha de û belge jî ew e ku her hemû hêzên siyasî yên kurd di ragehandina xwe de her du kurmanciyan bi kar diînin û hindek zazayiyê jî.

Tiştê balkêş li dev alîgirên vê arasteyê ew e ku piraniya wan di gengeşeya xwe de aram û hêmin in û di nav wan dea akademiyên bispor di warê zimanî de hene û wek me li destpêkê jî gotî ne hemû kurmanc in, wek Dr. Emîrê Hesenpûrî, Profesor Wirya Omer Emînî û gelekên dî. Her wesa ew di danûstandina xwe de dîtina muxalif bi gotinên sivik wek »herêmçî« û »piyawî desthilat« û »diyalektbaz« û htd. tawanbar nakin.

Zimanek û du standard

Ez ergumentê ku eger neteweyê kurd take zimanê standard nebe, dê yekîtiya wî di gefê de be rast nabînim, ji ber ku gelek netewe hene take zimanê wan yê standard heye lê ew neşiyaneyekîtiya xwe pêk bînin. Neteweyê ereb ku pitir ji 250 milyonan e û li ser pitir ji 20 dewletan belave, yek zimanê xwe yê standard heye, lê wî zimanî heta evro, ne tenê du dewletên erebî nekirine yek, belku heta nuke neşiyaye peywendiyên van dewletan bi hev re jî asayî bike. Serbî û bosniyan yek zimanê standard hebû, lê ew nuke ne tenê du neteweyên cuda ne, belku du neteweyên dijmin in û di şerê di navbera wan da rûdayî tawanên weha mezin rûdan ku hemû mirovayetî pê êşa û di hawara wan de çû.

Berûvajî, bi dehan nimûne hene ku pitir ji neteweyekî û zimanekî lê hene û di ser hindê re ew bi hemahengî û harmonî dijîn û ev pirneteweyî û zimanî çi cara nebûye gef li ser yekîtiya neteweyî û nîştîmanî ya wan, wek Swîsrayê ku çar ziman tê de fermî ne û wek Fînlandayê ku du ziman lê fermî ne û wek yekîtiya Ewropayê ku hemû zimanên wê bi yek pile û paye zimanên fermî ne.

Ji van nimûneyên jorî baş diyar dibe ku tiştê yekîtiya neteweyî û navneteweyî diparêze ne yekbûna ziman, dîn û kulturan e, belku ew peywendî ne yên li ser binemayên demokrasiyê û rêzgirtinê li mafên mirovî ava dibin, her vê çendê jî weha kiriye ku eve pitir ji 200 salane yek şer di navbera du dewletên demokrat de rû nedaye û firezimanî û kulturî û dînî jî çi caran di welatekê demokrat de nebûye egera şer û nakokî û xwînrîştinê.

Ne dûr li vê rê pirsiyarek bête pêş ku ew nimûneyên min înayîn nimûneyên firneteweyî bûne û aya neteweyek heye ku pi-

www.arsivakurdi.org

tir ji zaraveyeka wî bûne standard û xwendin û nivîsîn pê dihêne kirin? Belê çendîn ziman hene ku pitir ji zaravayeka wî bûne standard. Zindîtirîn û serkeftîtirîn nimûne jî »zimanê nerwîjî« ye ku du zaravayên wî »Bokmål« û »Nynorsk« bi yek pile û paye zimanên fermî ne û tenanet li ser bergê pasporta wan jî navê nerwîjî bi herdu zimanan dihête nivîsîn »Noreg« û »Norge«

Bo çi li Nerwîjê du zarava bûne standard?

Çawa ev herdu zarava bi awayekê fermî di karûbarên gîştî de bi kar dihên? Ji bo bersivdana van pirsiyaran ez bi fer dizanim ku hindek li ser ezmûna Nerwîjê rawestim.

Nerwîj

Şaneşîna Nerwîjê dikeve bakûrê Ewropayî û yek ji welatên Skandinavyayê ye. Bi rûberê xwe ve pitir ji 100 hezar kîlometrên duca ji Îraqê biçûktir e û çar milyon û nîv mirov lê dijîn, wek gelên swêdî, danmarkî, îslandî koka wan jî vîkîng in. Li sala 1300-a zayînî Danmark Nerwîj û Swêdê dagîr dike. Li sala 1500-ê Swêd xwe rizgar dike lê Nerwîj dagîrkirî dimîne heta sala 1814-ê ku Fransa wê ji Danmarkayê cuda dike, lê wê dike parçeyek ji Swêdê, heta sala 1905-ê ku wê serxwebûna xwe ragihandî. Li Nerwîjê du zaravayên nerwîjî -her wek me gotî- digel zimanê samî fermî ne. Bokmål ku zimanê 87% ji xelkê Nerwîjê ye li başûrê wê bi kar dihêt. Nynorsk zimanê 12% ji xelkî ye û ew li bakûrê wê bi kar dihêt. Samî zimanê 1% ji koçerên Nerwîjê ye û ew jî li bakûrî dijîn.

Çawa du zarava bûne standard?

Dema Nerwîj li jêr desthilata Danmarkê bû zimanê danmarkî zimanê fermî bû û nerwîjî bi tenê zimanê axiftinê bû. Piştî ku vê rewşê pitir ji 500 salan vekêşayî, nerwîjiyan li sala 1830-ê daxwaz kir ku ew bi zimanê xwe bixwînin. Ew li sala 1885-ê mil bi milê danmarkiyê bû zimanê fermî û ew ziman bokmål bû. Bokmål gelek ketibû jêr kartêkirina danmarkiyê û bi tenê li başûrê Nerwîjê bi kar dihat û xelkê bakûrî bi zaravayeka dî diaxiftin.

Du zimanzanên nerwîjî »Ivar Aasen« û »Knud Knudsen« hatin teklîf kirin ku zimanê nerwîjî bi serûber bêxin. Ivar li gundan geriya û peyv û edyomên resen yên nerwîjî kom kirin û rêziman nivîsî. Knudî jî hewil da nerwîjiyê ji danmarkiyê pak bike. Herdu proje ji bo perlemanê Nerwîjê hatine pêşkêş kirin û li sala 1929-ê perlemanî biryar da ku herdu bibine zimanên fermî li Nerwîjê.

Yê Ivarî amadekirbû »Nynorska« anku nerwîjiya nû bû û yê Knudî jî ma »bokmål« anku zimanê kitêbê, ji ber ku berî hîngê jî pê dihate nivîsîn û kitêb pê derkeftibûn. Ji hîngê were û heta evro jî çi arêşe dernekeftine û di ser hindê re ku nynorska zimanê bi tenê 12% ji xelkê Nerwîjê ye, lê wekhev e digel bokmålê û gelek nerwîjî yên »nynorsk« ne zaravaya wan e jî wê dixwînin, pê fêr dibin û siya-

www.arsivakurdi.org

seta dewletê ew e ku her nerwîjiyek herdu zimanan bizane û gelek kar hene eger mirov herduwan nezane neşêt bi dest bêxe. Li jêr çend hijmar û statîstîk hene ku pitir belavbûn û bikarhatina wan diyar dikin:

Nerwîj dabeş dibe ser 20 parêzgehan: 16 parêzgeh; zimanê wan bokmål e. 4 parêzgeh; zimanê wan nynorsk e. 432 belediye hene: 160 belediye; bokmål 114 belediye; nynorsk 158 belediye; herdu ziman

Li sala 2006-ê »617.237« qotabî li xwendina seretayî bûn û ew bi vî rengî li ser zimanan belave bûn:

87% bokmål
13% nynorska
10% têkel
Rojnameyên seranserî:
89% bokmål
6% nynorsk
5% têkel

Min ji rojnamevanekê nerwîjî »Georg Kristiansen« ku dostekê gelê kurd e pirsî »Eger perlemanê we li sala 1929-ê biryar daba ku yek ji wan du zaravayan fermî b, ne herdu, da çi be?« Wî got: »Ew biryar da biryareka entîdemokrat be û biryarên entîdemokrat jî bi dirêjahiya dîrokê bûne egera arêşe û nakokiyan û gelek caran xwînrişтinê jî.« Paşî pê ve çû û got: Eger me weha nekiriba, ez dûr nabînim ku nuke nerwîjî du netewe ban û Nerwîj jî dû dewlet ba. Kewate cot-standarbûna zimanê nerwîjî yekştiya neteweyî ya wî parastiye û ew dîtina hindek kurdan heyî ku dustandardî dê du neteweyan pêk îne dîtineka nerast e û bi baweriya min û çi bingeh ji bo nîne.

Li dûmahiyê min divêt bêjim ku ez sepandina take zimanê standard, êdî her zaravayeka kurdiyê be, li ser hemû neteweyê kurd, ne evro û ne jî di paşerojê de rast nizanim yan di pêçêbûnan de nabînim. Di heman demî de ez dizanim firestandardiyê jî arêşeyên xwe yên mezin û aloz hene. Lê min guman nîne eger em bi niyeteka pak û bi canekê zanistî û babetiyane û dûr ji demargîriyê danûstandineka ciddî bikin û pena bo ezmûna gelên zimanên wan firestandard in û bo şareza û bisporên kurd û biyanî bibin, dê çareyên baş bo hemû pirsên hilawîstî hêne dîtin.

Têbînî: Kulturnameyê ev nivîsar ji hejmara 46-ê ya koavar Peyvê wergirtiye û ew aniye ser tîpên latînî. Muyed Teyib, ji bilî ku yek ji helbestvanên herî navdar yên başûrê Kurdistanê ye, ew herweha berpirsiyarê weşanxaneya Spîrêzê ye û endamê Akademiya Kurdistanê ya li başûrê Kurdistanê ye.

Jêder: www.kulturname.com

www.arsivakurdi.org

Li ser koka mîren Ezîzan û Diyadîn-li Bedlîsê

Jordan

Li gor riwayetên kesên eşireta Rojkî (yek roj, rokê da) ji yekitiya 24 eşîretên kurd pêk hatiye. Ev 24 eşîretên han rojekê li ciyeki navê wê Tab ê li derûdora Xwêt ê (Huvît; li rojava (roava) berhev dibin û vê yekitiyê pêk tinin. Ev civaka han ya ji qebîleyan pêk hati, pişt re bi ser du şaxên giring ve belav dibe. Bilbasî û ya diduyan re ji Qewalis hatiye gotin. Gotinên Bilbas an Bilbis û Qewalis (Kavalisi) jî, navê du gundên mîrekên Hekkariyê ne. Li gor riwayeteka din jî, ev herdu gotinên han navê du qebîleyên ji eşireta Baban in.

Ji bo rêvebiriya kar û barên xwe yên hunduri Mîrek helbijartin.

Rojkîyan Bedlis û Hezo bi temami sitandin û ev herdu navçe weki mîrektiyên serbixwe û xwediyên wan ên esli bi rê ve birin, mîrê wan ê ku desthilata wan di destê wi de bû û kar û barên wan dimeşand, çû rehma Xwedê. Lê tu zarokên wi yên ciyê wi bigrin, li pê neman. Vê rewşa han, rê da ku di navbera Rojkiyan de têkilhevi derkeve. Serokên wan li ber hev seri netewandin.

Piştî ku demekê rewş bi vi awayi ma, serokên eşîret, qebîle û malbatan li ber vê rewşê geriyan û xebitîn ku çareyek jê re bibinin. Rûniştin û bi hev şêwirîn, di dawiyê de biryar dan ku, ji bo bên di nav wan de bi cîh bibin, biçin ba du birayên navên wan Izzeddin û Diyaeddin ên ji nesla Sultanên Kisrayê (Hukumdaran sasanîyan) yên li Xelatê (Ahlat) rûdiniştin. Bi vi awayi, wan ê ji van herdu birayan kijan kêri meşandina kar û barên xelkê tên, ew tecrûbe bikiraya û hin bibûya; dê wi ji bo mîrektiya xwe helbijartina. Ji bilî vê jî dê bi dil û can rî'ayeta wî bikirina ku wi Ji bikariya welat pêş da bibe û bî destekî hesini li serê wan kesên rêzxeraker û şerfiroşan bixistaya û dadgeriyê bi şêhineka rast dipîva bi rê ve bibira.

Ji bo ku vê ditin û niyeta xwe cîbicî bikin, heyetek ji giregirên eşireta Rojki pêkhati, çûn Xelatê û bi qebûlkirina ji aliyê van herdu kesên esîl ve serfrraz û serbilind bûn û wan bi awakî qedir û siyanet anin Bedlisê. Di dawiyê da, lzzeddin ji bo

www.arsivakurdi.org

Bedlïsê û Diyaeddin jî ji bo Hezoyê hukumdar helbijartin.

Hat dîtin ku xelkê Bedlïsê ji Izeddîn zêdetir, hêdî hêdi meyl û sedaqeta wan ber bi Diyaddîn ve ye. Xelkê Bedlîsê ji Izeddîn sar bûn, nefret Jê kirin û li hemberî wî qet evinek di dilê wan da peya nebû. Diyaeddîn Jî ji vê rewşa lê hatî, îstîfade kir; bi taybeti dema ku zanîbû helwesta gelê Bedlîsê li hemberi wî di sewiyeke herî li bar û bilind de ye. Ji bo ziyareta birayê xwe çû Bedlîsê. Li wir, pêşwaziyek gelek baş lê hat kirin, rêz, qedir û mêvan-perweriyeke mezin dît. Herdu birayan di nav daristan û bahçeyên dewlemendên Bedlîsê de, demên xweş derbas kirin, di nav aheng û şahîyên xwe de çûn civin û meclisan. Vê rewşa han mecal û firset da Diyaddîn ku bizane, xelkê Bedlîsê ji giregiran hidre heta xelkên rêzê meyl û sedaqeta herkesê bi wî re ye. Ji bilî vê, av û hawayê Bedlîsê jî tesîrî wi kir. Ji ber vê, Mîrektîya Bedlîsê xist serê xwe. Piştre Dîyaeddîn bi parêzkaren keleyê re li ser tertîbateke wiha li wev kirin: Bêguman dema ku ez ji bo vegerê ji kela Bedlîsê derkevim, dê birayê min jî bo bi rêkirina min ji keleyê derkeve. Ez ê wê çaxê ji bo bihaneya bîrkirina tiştekî xwe keleyê de, paşta vegerim. Dema ku ez bikevim hundur, dê hûn deriyên keleyê li ser birayê min bigrin û ez jî dê bi vê firsetê kele bistînim.

Wext derbas bû û dema vegera Diyaddin hat. Ew jî çû ba birayê xwe û îzna vegera xwe ya Hezoyê jê sitand. Izeddîn jî ji bo rêxistina birayê xwe derket derveyê keleyê û bajêr. Piştî qasekî meşîyan, Diyaddin li birayê xwe zivirî û jê re got ku wî hingustîla xwe li keleyê Ji bîr kiriye û ji bilî wî jî kesek ciyê wê nizane. Eger ew destûrê bide û qasekî li vir xwe mijûl bikin, dê bi xwe biçê û bîne. Li ser vê, Izeddin dawxaza birayê xwe qebûl kir û li wir sekinî; bi nêçîrê ve mijûl bû û ma li hevîya vegera birayê xwe. Diyaddîn ket hindurê keleyê û çawan bo hev kîrîbûn, bi wî awayî kir û derîyê keleyê li ser birayê xwe girt û piştre jî ji birayê xwe re xeber şand û jê re wiha got:Xûyên baş di nav du brayên de ewê ku birayê min li şûna min de çend rojên xwe li Hezoyê derbas bikê.Di vê navberê da , ez jî li Bedlîsê bimînim û ji xweşî û sipehîtiya av û hewaya wê îstifade blkim.

Li hembêr vê rewşa han destên Izeddin di paşla wî de man û hîleya birayê xwe hesiya. Bi vi awayî, Izeddîn neçar ma, çû Hezoyê û rêveberîyê vî welatî girt dest xwe. Belê, Mîrên Hezoyê ji nesla vi mîrê ne û ji ber vê bi navê "'**Ezîzan**" hatine nas kirin, Mîren Bedlîsê jî ji nesla **Diyaeddîn** in û ji ber vê ew jî bi navê Diyaeddîn hatine nas kirin.

Çavkanî:

ŞEREFNAME (Weşanên Apecê, 1998.)

www.arsivakurdi.org

li balkon rûniştime
hewayê tam li gorê heşe min e
hîv hîng nehatîyê
hêstirkên dihilîzine
û hêstirkên tirijêne
li ber min kaxiz û pênûs
lê kêmasiyêkê heyê

pitpitikê li doralîyê lambê dans dikine
û dikevine hundirî lambê û dişewitine
ne yêk ne dudi
ma dîyaloga wanan bi hevdû re tunen
bayî bakurêyî tişten vedişêrê û aşîkar dike
û ji dûrê da dengî dohl û zûrnê car carna tîne
dengî zangilanî pir ji dûrê da tê
cîvanên dohl û bi dohl li riskan digerine
hevalî min Hasê bi wanan re digot; kerîyê şêytên
li navbarê malan da kucikekî tembel û tembel diqewitê
hîv helat
li gorêstên gorên misilmanan û gawiran li kelekên hevdû
jin û mêr ferkneke wek heval û doste rakatinê
ji alîyê kanîyê malê şêhê da dengê baqbaqen dest pêkir
mercedesekê sewqe xwe da ser rê
sîya sê jinan ku bi alav bi hevdû re deng dikirî li ber şewqê cirifîn
jinê kê tê bîra min pişta xwe yê da dîwêrî malê xwe
li dûrê temaşe dikê
bendewar e
mala mînê

rêzekê dinivîsînime
min ji rêzê hezkir
lê kêmasîyêkê heyê
dengên zaroka ji dûre da têne

www.arsivakurdi.org

di nav wan dengenan da
girîyê kecikekê derdikevê pêşîyê
tonî girîyê xwe yî wek notên mizikeke bi xem û xemgin e
dixwazê derdî xwe bi tonên girî îfadê bike
kecikan bi girî makin
totek danîştê
ser telen harimê
qirnîyâ çûçikekê hat

rêzen ku min nivisandî min dirandin
eger meri ji tirî şerabê cêneke
darên zîwa bibin
min dûr û dirêj li têlên bi sirîyên li ser harimê mezekir
xoca ezan da
sê û car sihên kalan berve camîyê cûn
derdorê tijî erebe ye
piraniyên ereban ê karkeren ku li welaten dûr û welaten xerîb
kar dikine
ewê li cîvanîyê xwe digerine
bedêlekî giranê
rebenên min
herder toz û duman e
insanên li navbarê rîyan digerine
û fişêkên hewayî bi hêstirkan re ketine pêşbazîye
du û sê rêz nivisandin
min ew rêzene nehêjandin
lê kemasîyêke mezinê heye.

seyfi dogan

www.arsivakurdi.org

KİLAMEKE ŞÎNÊ
Li ser Xeloyê Delşi Pepê

Amadekar: Nuh Ateş

Kurmanc mirîyên xwe bê şîn û kilamên şînan ranakin. Hosteyên şînê û lihevanîna kilamên şînê pirtir jin in. Ew ji heqe vê hunerkarîyê tên der. Ji jin û mêrên ku kilaman rind lihevtînin û distrên ra dibên "şarê." Ew êş, keder û keseran li pêyvan bar dikin û bi ahengîya stranê hundirê mermalî û xismên yê mirî vêdisînin. Stranbêj li jêr jî jin e. Wê ew 85 salan di ber vê li ser birayê xwe, Xeloyê Deli Pepê straye. Xeloyê Deli Pepê ji gundê Boxazkaya ya Haymane ye. Wî di wexta xwe da eşqiyatî kiriye û ji ber vê teve hevalên xwe di sala 1924an da li Haymaneyê bi destê hêzên dewletê hatiye kûştin [1]. Ciyê gotinê ye ku meriv ji xweberê nabe eşqîya yan jî ji dayika xwe da eşqîya nakeve. Pir caran ji neçarîyê û ji ber zilm û neheqîyên hîngê meriv dibûn eşqîya. Stranbêj me di derheqa merem û hestên xwe û egîtî û serhatîyên birayê xwe da hayadar dike û rexne li serdar û mesulên wê demê digre. Ji bo ronîkirin û pêzanîna bi bûyêrên tarîxî û ji bo parastina dewlemendîya zimanê kurmancî berehevkirin û weşandina kilamên han karekî muhim û bi kêr e.

Min ev versîyona vê kilamê ji devî Fata Îsmê (Behzatoglu) ya rehmetî ji Xelikên jor (Karacadag.Kulu/Konya) wergirt. Fatê ew li ser şerîtê (kaset) straye û min jî ew li gora strandina di şerîtê da nivisî.

www.arsivakurdi.org

Kilama li ser Xeloyê Deli Pepê

Xelîl Bego qurban mêrê Satê gêh mêrê Satê gêh
ji te ra bi dêr ketîye sêsed sîwarî gêh vê hukmatê gêh
Xelîl Bego qurban mi go here di ser kerîyek pezî gêh
xwe ra gav ke gêh
here li ba Kêmêl[2] rûne berke xetê ka beratê

qirbîyê Xelî mi filike
î berdaye Enqera şewitî dara nike
te ji xwengê xwê kwîrik ra xwe pesinî
te go xwengê xwengê, xweng kwîr bibe,
sêsed sîwarî Bolîyê[3] ji mi ra hendike

Xelîl Bego qurban berdê

hala cîya şewitî, bişewite hala hozê
de ya ji şîva da tê dengê topê û metirlozê
ar di mala gawirê Bolîyê keve
koza du bira hîşte heyazê
bejna zirav dara çamê gêh
qirkê gewre şûşa lambê gêh
bajarê Xelîl Begê mi lê newû
ez a bar kim herim bajarê gêh Nefîrqamê

Xelîl Bego qurban berdê

hêle hêle Xelîl Bego qurban hêle
çi lê hatîye Xelîl Begê naskine li ser nêrê
(…..) şewitî nema li ber nigên xwengê gêh
(….) li bin kêrê

Jêder:
[1] Halil İbrahim Uçak, Tarih İçinde Haymana, 1985, r. 98
[2] Ji Kêmêl qest Mustefa Kemal e
[3] Boli (Bolu) bajarek e û wer tê fehmkirin jenderme yan eskerên ku Xelê Deli Pepê û hevalê wî girtine ji Bolîyê hatine (…) hen gotin nehatin fehmkirin, lewma min şûna wan bi nixte nîşan kir

www.arsivakurdi.org

Gotinên pêşîyan û biwêjên kurdî ji Anatoliyê kitêbeka nû ya Rebenê Cêlikan

Biwêj û gotinên pêşîyan rewş û xemla zimanekî ne. Bê biwêj, bê gotinên pêşîyan ziman, zimanekî tamsar û nexweş e.

Axaftinekî ku têda biwêj yan gotinekî pêşîyan tê bi kar anîn, bala merivan dikişîne û zû-zûkê ji bîra meriv nare. Ji xwe sedema hêbûna biwêj û gotinên pêşîyên di zimanê me da jî ew e; Balkêş û xweşikkirina axaftinê.

Em di jîyana xwe da dibe ku bi hezaran şîretan ji mezinên xwe dibîhîzin (eger meriv hinekî jî li ser henîyê xwe be, hejmara şîretan ji hezaran digihîjê ezmanan). Lê em çi bikin jî van şîretana hemû di bîra me da namînin, ji bîr dibin û terin.

Bawer dikim, mezinên me zû bi vî halê hesîyane. Loma wanan gotinên xwe bi awayekî ûsa gotine ku em çiqes guh nedin ser jî ew gotinana tên û bi guhên me dikevin.

Bav û kalên me fikrên xwe yê ku ji piştê tecrubeyên dûr û dirêj bi der ketî holê di gotinên pêşîyan da ji me ra gotine. Û ji bo ku em guh bidin ser, wanan gotinên xwe bi awayekî taybet hûnandine;

Hinekan mîna hekatekî qal kirine û li ser bihêzbûna dilketinê, gotine;

”Mêrik dilê xwe ketîye, kûşkara kevnar heft sala di berîyê xwe da gerandîye”

Ew bûyera kêngî bîye? Rast e yan ne rast



e? Em nizanin lê, ew gotina îro, kes nizane ku çend wext in, hîn di nava gêl da tê zanîn û bi kar anîn.

Hinekan jî gotine;

“Însan, têyrê vê qened e”

Û halê insanê ku qet qinat nake, ji ber vê yekê ji wir dibeze wira, ji wir dipeke wira, şibandine ser ser halê çûçikêkî bê qened û bask. Bi vê gotinê bala me kişandine ser vê halê me.

Wekî van mînakana hîn çend awayê balkêş hê ne di gotinên pêşîyan da. Ew xweşik in, balkêş in.

www.arsivakurdi.org

Çavres zû ke

herem: Anatolya navîn



Zû ke zû ke çavres zû ke
Arekê dade ma zirav dû ke
Min îsev xewneka xwe dî
Ez bûm zava çavres bûke

Êdî were lê çavresê
Li serêmin nehîste fikir hesê
Gewra rindam bi sara resê
Êdî were lê çavresê

Nabe nabe rindî nabe
Ew halê me wiha nabe
Destê xwe di destê minke
Bila dilê me bi hev sabe

Bîra mala bavê te gimgime
Ez ji rêyake pir dûr tê me
Anê ne tîme ne birçî me
Bi emrê xwedê xwezgincî me

www.arsivakurdi.org

DI KURDÎ DE NAVÊN MEHAN



Di kurdî de navên mehan pirsgirêkeke mezin e. Ji derî zaravayên soranî û kirmanckî (dimilî-zazayî) di zaravayê kurmancî de hema hema her dem û dezgeh an jî nivîskar li gor herêm an jî dilê xwe nav li mehan kirine û dikin.

Ji ber vê yekê salnameyên curbe cur hene û navên 12 mehan tevlihev in. Min xwest balê bikşînim ser mijarê ka kîjan dem û dezgeh navên 12 mehan çawa bi kar tîne, di vê tabloya jêrîn de destnîşan bikim. Pêwîst e ku em kurmanc li ser nevên mehan li hev bikin û lîsteyeke hevpar amade bikin. Ev kar jî dikeve ser milê dem û dezgeh û zimanzanên kurdan.

Dema mirov bi baldarî li tabloya jêrîn dinêre, dibîne ku gelek dem û dezgeh ji derî mehek du mehan hema hema wek hev dinivîsin. Qet nebe yên nêzîkî hev li ser wan mehan bi hev bikin. Bi hev bikin dê qiyamet radibe, çi dibe an dê prestîja wan bişike? Tiştekî ecêb lîsteya NÇM, Enstîtûya Amed û Îstannbolê û Azadiya Welat, ROJ TV û Newroz TV ne wek hev in. Heman kes ji çend mehan carekê ciyê karê xwe diguhêrin. Dema li gor dem û dezgehan ciyê karên wan tê guhertin, herweha salnameya wan jî tê guhertin. Dibe ku yê/ya ku emîr dide şefredaktor e û her kes pêwîst e wek şefredaktorê xwe navên mehan bêje û binivîse! Gelo şefredaktor bi awayekî otomatîkî dibin salnameredaktor jî?

Amed Tîgrîs

Zarava û sazî	Soranî	Kirmanckî (zazakî)	Kovara Hawar	Înstîtûya Parîsê, ya Brukselê Kurd1 û Newroz TV	NÇM, Înstîtûya Amed û ya Stanbolê	Azadiya Welat û ROJ TV	Komkar, Roja Nû, Dema nû û koma mamsosteyên kurdî li Swêdê
meha 1´em	rêbendan	çele	kanûna paşîn	çile	rêberdan	çile	çileya paşîn
meha 2´yem	reşeme	sibate, gucige	sibat	sibat	reşeme	sibat	sibat
meha 3´yem	xakelêwe	adare	adar	adar	adar	adar	adar
meha 4´em	gulan	nîsane	nîsan	nîsan	avrêl	nîsan	nîsan
meha 5´em	cozerdan	gulane	gulan	gulan	gulan	gulan	gulan
meha 6´em	pûşber	hezîrane	hezîran	hezîran	pûşber	hezîran	hezîran
meha 7´em	gelawêj	temmuze	tîrmeh	tîrmeh	tîrmeh	tîrmeh	tîrmeh
meha 8´em	xarmanan	tebaxe	tebax	tebax	gelawêj	tebax	tebax
meha 9´em	rezber	êlule	îlon	îlon	rezber	îlon	îlon
meha 10´em	gelerêzan	oktobre	çiriya pêşîn	cotmeh	kewçêr	kewçêr	çiriya pêşîn
meha 11´em	sermawezt	teşrîne	çiriya paşîn	mijdar	sermawez	mijdar	çiriya paşîn
meha 12´em	befranbar	kanûne	kanûna pêşîn	kanûn	berfanbar	kanûn	çileya pêşîn

www.arsivakurdi.org

MİRÎMÎRAN, ALİŞAN BEYİN MEZARI

Amadekar: Dr. Mikaîlî

*Howe alh'ey albaqî **	
Beni qeyd moi'qerat Reb Yezdan	*Beni qeyd mukaderat rab yezdan*
Bi heqî erşî ei'z'emî nur Qora'n	*Bi haki arşi azimin nuru Kuran*
Kulo qebri min ziyarat beden ixwan	*Kulun Kabrini ziyaret eden ihvan*
Iydiler roh'in bir fatih'e îh'san	*Ediyler ruhuna bir Fatiha ihsan*
Ist'ebil acire mudîriyen	*Ist"ebil acire müdüriyen*
Izlenlolerınnen merh'um	*Iylenlulerindan Merhum*
We meg'furli izetli Elişan Alfatih'e.	*Ve mağfurlu_izzetli Alişan ruhuna El Fatiha*
Sene (Sal) 1274 Hicrî / 1857 Mîladî c.	Vefat: Sene 1274 Hicri/ 1857 Miladi Alfatih'e.

Kurtî ya vê parçe helbestê:
Ji bo heqîya Erşê mezin û ronî ya Quranê, fatihekê bidene ser ruha rihmetî, xwedê jêrazî û qencî Elişan …Dîroka wê sala 1274 mişexti beramberî sala 1857 zayinî.

Günümüz Türkçesindeki anlamı; Alemlerin hakimi kutsal Kur'anın hakkı için, Allahın razı olduğu, iyiliksever, izzetli ve mağfurlu Alişan Beyin ruhuna el Fatiha. Vefat : 1857(Dr.M.).

Bu mezar taşının Mir Alişan Beye ait olduğunu kanıtlamak için Sayın Mehmet Bayrak'ın daha önce dergimizde yayınlanan Kürt Alişan Bey yazısından Aşık Dertli ve Bereketzade İsmail Hakkı Beyin aşağıdaki şiir ve yazılarını da tekrar okuyucularımızla paylaşmak istedim.

Aşık Dertli'nin Alişan Beyin kızkardeşi Bostan hanıma olan aşkını anlattığı Dertliname adlı mesnevisinde beyitlerine şöyle başlar;

Bin iki yüz altmış bir isdi sal (Yıl)
Ankara'da oldu bu surette hâl
Ankara sükkani gani ve fakir
Gördüler ol hâli sagir ü kebir

Yani 1261Hicri (1845 Miladi) yılı Ankara' sından bahsetmektedir kî; bu Alîşan Beyîn 1857 olan vefat senesîne uymaktadır.

Yîne mesnevinin bir başka yerinde Mir Alişan Beyi övmektedir;

Gördüğü amma ki bülend- astihar
Alişan denilmek ile namdâr
Hüsn ile ol bir seh- i hûban idi
Mîr değil, doğrusu bir sultan idi
Biz dahi gördük ol Beyi hayli dem
Doğrusu bir mîr- i mehsin- siyem

www.arsivakurdi.org



Alişan Bey torunu, Ahmet Kökten

Prof . Fuad Köprülü; Dertli' nin Ankara esraflarından Alişan Bey e sığındığını ve Alişan Bey' in de Cihanbeyli kazasının Uzunlu köyüne mensup olduğunu, bir zamanlarda Diyarbakır Voyvodalığında bulunduğunu yazar.

Yine Osmanlı yazarlarından Bereketzade Ismail Hakkı adlı bir Osmanlı Yazarı 19. yüzyılda yazığı Yad- i Mazi isimli eserinde şu bilgilere yer vermektedir;

"İsmini unuttuğum bu karye, Cihanbeyli aşiretinden ve Kürd eşraf ve rüesasından Hacı Bey'le zevcesi olup Konya havalisinde meşhur Şair Dertli' nin vaktiyle hüsnü cemalini muhrik edalarla vasf ü hikayeti

Mutazammın birçok gazeller söylemiş olduğu Bostan Hanım'ın ikametgâhıdır. Ahiren mülhakatı devre çıktığım esnada, mezkur karyeye geleceğini haber almaları üzerine Hacı Beyle Bostan Hanım atlara binerek ve Bostan Hanım silahlarını takınarak tevâbiiyle birlikte bir saatlik yerden karşılamaya çıkmışlardı. Konaklarına misafir ettiler ve aşiretlere mahsus debdebe ve tekellüflerle fevka-ladeâsâr-ı ihtiram gösterdiler. Köyün delikanlılarıyla kızlar halay çektiler. Seyr ü temaşa ettik. Bizim gördüğümüz Bostan Hanım ihtiyarlamıştı."

Yukardaki tanıklardan İzzet Sadullah Efendi, Dertli ile aynı dönemde yaşayarak ondan birkaç yıl sonra 1264 (M. 1848)' de vefat etmiş.

Doğrudan Dertli'nin Alişan Bey ve Bostan Hanım'la ilişkilerine tanıklık etmiştir. Diğer kaynak Bereketzâde İsmail Hakkı'nın ise Dertli'nin ölümünden sonra Hacı Bey diye biriyle evlendikten sonraki yaşlılık döneminde Bostan Hanım'la tanıştığı ve misafir edildiği anlaşılmaktadır. Buradaki ilginç anlatımlardan biri de, onun şair Dertli ile ilişkisinin hâlâ dillerde dolaşmasının yanısıra, at binerek silah kuşanmasıdır. Tam da geçmişteki Kürt kadınına uygun bir özellik. O tarihlerde Ankara, nüfusu elli bini bulmayan, mütevazi ve oldukça geri bir Orta Anadolu şehridir. Bu aşamada Dertli'ye korumalık yapan Alişan Bey, yazları Ankara ilçelerinde, özellikle Haymana' da, kışları ise çoğunlukla Ankara'da geçirmektedir. Öyle anlaşılıyor ki, Alişan Bey'in hem Cihanbeyli hem de Haymana ile ilişkisi vardır. Kendisinin Canbegan aşiretine mensup olduğu anlaşılmaktadır.

www.arsivakurdi.org

Kürt Alişan Bey'in Mezarını bugün bir ilçe olan Konya' nın Çeltik'te buldum. Şehir merkezindeki Selçuklulardan kalma olduğu söylenen güzel Caminin giriş kapısının yanındaki tek mezar ona ait. Yukarıda size sunduğum tercümesi de bunu gösteriyor zaten. Tarihleri de çakışıyor. Alişan Bey; 1274 Hicri (1857 Miladi) yılında vefat etmiş.

Caminin üzerindeki taş yazıtta da Alişanzade Halil ve Ömer beylerin bu camiyi 1814 yılında tamir ve restore ettirdikleri yazıyor. Yani Alişan bey'in vefatından 43 yıl evvel.

Alişanzade ailesinden aldığım bilgilere göre, üç nesil Alişan Bey sözkonusu. Yani Ömer, Halil ve Battal Beyler bahsi geçen Kürt Alişan Beyin çocukları. Ömer Beyden geriye çocuk kalmıyor. Halil Beyden de Derviş, Ömer ve Ahmet beyler kalıyorlar. Aileden Derviş Bey Çeltik' te Kaymakamlık yapıyor ve Pîribeyli Kürt köyünden evli.

Alişan Beyin torunlarının anlattığına göre 1960 askeri darbesinde Çeltik nahiye müdürü tüm eski mezarları kırıp atıyor. Yani İç Anadoludaki bu en büyük Kürt Beyine ait yazılı tüm geçmişi tahrip ediyor. Bence bu bir tesadüf ya da bir Nahiye Müdürünün şahsi bir uygulaması değil! Bilinçli bir tarihi gerçeği yoketme hareketi.

Böylece Sayın Mehmet Bayrak' in izini bulup dergimize yazdığı Kürt Alişan Bey' in izini mezarına, ebedi istirahatgahına kadar sürmüş ve sonlandırmış olduk.

Bilmek, görmek ve ziyaret etmek isteyenlerin bilgisine sunulur.



*-Alişan Beyin Mezar taşını Osmanlıca'dan Kürtçe'ye sayın Mahir Berwari tercüme etti. Bende onları Kürtçeden Türkçe'ye çevirdim.

www.rsivakurdi.org

Wênê nimre 1

Cihanbegli Eli an Mîrzadeler
S'ewab we ocre anin eyleriler
Idub bo Camiî tecdîd we ta'mîr
Dîdî tarixin anin bo moselî

Xelîl beg hem Omer beg namî merdan
Mihelinde bu ikî mîr zî an
Muceded eylediler imdî Imran
Bu wala cami' oldî xo binyan

Sene (Sal) 1230 hicri /1814Mîladî (Zaynî)

جـــهان بگلی علیشان میرزادلر
ثواب و اجـــــرة اهنک ایلرلر
ایدوب بو جامعن تجدید و تعمیر
دیدی تاریخن آنـــن بر مصلی

خلیل بگ هم عمر بگ نام مردان
محلندة بو ایکی میر ذی شـــآن
مجدد ایلدیلر شمدی عـــــمران
بو والا جامع اولدی خـــوش بنان

هجری1230 /سنـــة



Ronkirin:

1 Eve parçe helbesteke/ qala avakirin û tamîra Mizgeftekê diket, pesna sê kesa diket ko wan ev karê qenc kirine; begê cihanê Eli an, Xelîl beg û Omer beg.
2 Peyva (Zî), bi hizra min erebî ye, mana wê xwedî ye.
3 Heke we ji peyvên dî yên Erebî famnekirin min agehdarken.
4 Sala avakirin, tamîr û destpêka nivêjlêkirinê bi tarîxa mi extî û zayinî hatiye zelalkirin.

*-Alişan Beyin Mezar taşını Osmanlıca'dan Kürtçe'ye sayın Mahir Berwari tercüme etti. Bende onları Kürtçeden Türkçe'ye çevirdim.

www.akademikurdi.org

ÇÛKA BERBANGÊ

Xizan Şîlan

Ji salên ku li ber pêlên çemên dîn û har têkçûyî demsaleke payîzê bû. Xemgîniya şeveke ji şevên bêxewiya xopan dil û kezeba min parçe parçe kiribûn bi xençereke devtûj. Di navbera çar dîwarên mîrata quncikên odeyê de, giyanê bedena min di bin barê keser û axînan de diperpitî. Li nav ramanên jankêş û bîranînên westiyayî nema xew ketibû qalpaxên roniya çavên min yên qerimî. Min bi kûr kûr kişandina hilma cixara xwe re, li balqonê, li rûyê asîmanê temaşe dikir bi awirên vik û vala, piştxûz mîna pîr û kalan. Mij û dûmaneke reş xwe dagirtibû ser daran. Pelên şaxên daran ji tirsan bi xwe de ketibûn. Li ser şaxên darê çûkeke xerîb û bêkes venîştibû. Ji alikî de zikê asîman qelişti bû. Wekî ku hêrs û nefreta tofanên serdeman xwe li qirika ewrên bixof pêçabû, barana tirsê dibarî bi dijwarî û dixuşiya mîna maran. Lê çûka li ser şaxên daran, ji serman diricifî û can lê dilerizî, mîna keç û bûka kezî ku ji ber fediyan dibezî û xwe vedişart bi dizî. Bi dengê brûskeke erjeng re ji nişka ve veciniqîm. Wekî ku di xweziya xwe de bifetisim sergêj û sermest li derdora bizdonekiya laşê giyanê xwe dizivirîm.

Çûkê! Ez jî îro mîna te bêzar im, gula baxê dilê min çilmisandin, bêcîh û bêwar im. Ji min re dibêjin tu çavînî bûyî, ev nezer in! Nizanim çima zimanê min li hev digeriya û peyvên min bi ser hev de werdigeriya? Rondikên tirsa dil, êş û keser, bedbextî û tenetî, sewdaserî, xem û xeyal, axîn û nalîna xewa şevên wêran hevalcêwiyên min in. Ez şevger, tu şeveder.. Ez dil bi keder, tu derbeder.. Ez evîndar û dilbirîndar, tu stûxwar li ser dara spîndar.. Dengê qîjqîja te mîna dengê xweşhevpeyvîna dayikên bermalî. Li nav baxçe û çîçekên xemilî û ji kezebê kûr kûr dinalî. Te stranên xeribiyê yên dil bi şewat bi awazên kul û kovanan dilorand li çar alî. Te mîna dengê bilûrvanê keserkêş, tembûrvanê hesretkêş berê xwe dida çol û beyaran, wek derwêşê gerok diyar diyar

www.arsivakurdi.org

digeriyayî. Ji awaza nalînên gewriya te kaniya hunerê diherikî nava derûniya giyanê helbestvan, wênevan û dengbêjan. Di êşa qêrîn û lorîna henasa te de kulîlkên gulistana bihuşta lal û bêdeng ji nû ve bi rengên kesk û sor dixemilîn, dikemilîn û geş dibûn.

Çûkê! Tu çima ji kûrahiya kerba dilê xwe dinalî û te dîsa wîçe wîçe? Wek feylezofê Alman Friedrich Nietzsche, min jî di ber xwe de niçe niçe, lê nizanim hişê min ku de diçe? Wekî ku ez porê serê xwe yê spî, ji ber êşa birîna kul û evîna dilan li xwe birûçkînim, te jî bi qêrîn û hawara xwe bêdengiya serê sibê diçirand û refên hechecikan li xwe dicivand.

Çûkê! Derdê te çi ye? Ma zikê çêlikên te birçî ye? Ma tu jî mîna min bêwelat î? Ma tu jî wek min li jiyana xwe sûvêhat î? Jiyana kolanên welatê xerîbiyê pir zor e. Yê ku nejî nankor e, yê ku nebîne çavkor e. Bêyî ku tu sînoran binasî, te li ser çiyayê Toros, Zagros, Cûdî û Qendîlê dîlana şadî û serbestiyê digerand li asîman û li meydanan. Tu bi dilekî şa û azad li taxa bajar û gundan, li havîn û zivistanan, li nav bax û bostanan, li nav daristan û goristanan, li ser pêlên derya û okyanûsan, di navbera Parzemînan de û li ser axa cîhanê welat bi welat difiriyayî.

Çûkê! Te jî mîna Bazê hêlîna xwe li asta herî bilind, li ser Zinaran di tenetiyê de avakiri bû ji qirş û qalşan. Ji min re bêje çûkê! Li quncikê sûkê, ma hêlîna te jî wêrane kiribûn mîna mala bûkê? Ez jî mîna te perşikestî û serşikestî, dilşikestî û milşikestî me. Xêrnexwezan stûna pişta hestên min qelişandin û hêviyên pêşerojê di talana demê de şerpeze kirin.

Ma kê coş û aramiya te di şewqa asoya berbangan de revandiye? Ma kê ronahiya çira hêlîna çêlikên te di xezeba xwe de tefandiye? Ma kê jiyana te li nav xwîna şerê demên rûreş herimandiye? Ma kê ev tîr û şûrê zengarî di sîngê te de daçikandiye? Ma kê gora te di lîtava dîroka genî de kola ye û laşê te li xiyaneta serdeman bi kefenekî reş pêça ye?

Ma kê?

Ma kê?

2009-02-14

Stockholm

www.arsivakurdi.org

DÎYARIYA BILO

Mihemed Hemo

Bi gotina binoş re piyalên me çûn dev û rûyên hev!

Bi gotina hûn li ser serî û çavan hatin re jî wek: Refekî çivîkan (Tulûr)ku ji gulistanekê rabe û cardin lê vegere! Piyalên me li masa xwe vegerîn. Masa me birengên xwarin û vexwardinên mizeyê Efrînê, ji tabloyekî Sîlfedor Dalî rengîntir û ciwantir bûbû.

Kasêtekî xwe spartibû gewriya taypê (Misecel). Kemança Dilşad dikalî û dinalî û xwe li guhên me badida.

Jinan diber hev de cigareyên xwe vêdixistin û di ber re jî li buhayê kirasên hev dipirsîn û navnîşanên cihên ku jê kirîne û terziyên li cem durûtin, ji hev dipirsîn.

Me mêran jî cigare li hev belav kirin, ji berî ku em dest bi xwarinê bikin, me dest bi sîyasetê kir û em pê axivîn.

Em li Salona mala Kamîran rûnştibûn, Dîya Kamîran jî li oda xwe xewkirbû, bêyî ku em bizanbin. Me nedît ku çawa deriyê odê vebû û Dîya Kamîra di ber kirasê xewêde jê bi derket, di devê derî de rawestî, ne baş li me temaşe kir, bi zerp derî girt û ket oda xwe.

Ji ber dilopên jinan, di ber axaftinên me re û yadin jî nêrînên me hemîyan di wê şevê de nêzîkî hev bûn, loma em pir di siyasetê de nepeyivîn.

Hevalekî Kamîran binavê Bilo; ji Bulgaristanê hatibû, wî jî têra xwe ji me re li ser welatê Bulgaristanê peyivî. Êdî me dest bi niket û henekan kir. Bû vîq vîq jinan, he,he ya me; mêran.

Deriyê odê bihêrs vebû. Me dît Diya Kamîran, serqot, bi derpîyekî dirêj û kirasekî kurt dîsa di devê derî de rawestî û nebaş li me temaşe kir. Me kir ku me, ew nedîtiye, hîn pirtir li wê giran hat, got: Xudê canî we bibe bes! Hele binirin her yek diya sê-çar zarokan e, fedî jî nakin!. Wey hûn bi qurbana navê jinan bin bes, Hele vîq-vîqan!! Hûn jî dibêjin em jin in ne ? Pû li we were!.

Me kir ku em nabihîsin.

Carek din bi zerp derî yê odê girt û ket oda xwe. Me jî şevbuhêrka xwe berdewam kir, her ku şev kal dibû, şevbuhêrka me geş dibû!.

Çinkê; şevbuhêrkên bi Kamîran re; gelek dewlemend û xweş in, Bilo jî merovekî gelek dilgeş û şên e.

www.arsivakurdi.org

Em ji ken û henekên xwe nediman. Dîya Kamîran jî her nîv saetê yan kêmtir carekê ji odê derdiket. Carekê bi navê hemamê, carekê bi navê vexwerdina avê, car bi car jî awirin tûj di me di diçikandin û di ber xwe de dipeyivî. Digot: Bi qurbana navê mêran kirano! Hûn ji ber simbêlên xwe ve fedînakin? Karê hûn dikin, cahîl nakin! Hîn gotinên xeraptir jî ji me re digotin lê me xwe kerr dikir.

Carekê ket oda xwe û wek: Saetekê jê bi derneket. Me ji hev re got: Mala Xudê ava! Pîr ket xewê, nema dertê.

Her ku şîşeyên me kêm dibûn, kenê me pir dibû û her ku piyalên me jî sivik dibûn, serê me giran dibû. Kenê me ketibû nav hev ji hev dernediket.

Ji nişka ve dengekî xurt bi Melê ket banga sibê bang kir.

Bi banga wî re zarokên me veciniqîn û qêriyan; pêla qêrîna wan digel banga melê, kenê me dan bin xwe! Nema zarokan xew dikirin, şevbuhêrk li serê me bû gola req û beqan!

Di wê ortê de me nedît ku çawa dîsa Diya Kamîran di ser me re rawestiye û dibêje:

– Hey hûn bi qurbana şekalên melê bûno, Bi qurbana muslimana bûno!!

Mele banga navê Xwedê dike, hûn jî vê kiratiyê vedixwin? Cardin em kenandin.

Kamîran: Dayê! Ma tu zanî mele ta vê sibê çend şîşe vexwerin e ? Eger wisa ne be, çawa dikane li ber destê vê sibê, vê dengê Dêwan derke?! Vaye li Heleb ê bang dide, Îstenbol bibîse.

Ew li vaqas xelik xewa şêrîn dihermîne, ji te û wî re guneye yan ji me re?

Me kutahî bi şevbuhêrka xwe anî.

Piştî du rojan me bihîst ku Bilo gihîştiye Bulgaristanê .

Şeş mehan li wir ma û dîsa vegerî Helebê.

Piştî vegera xwe bi du rojan, hat serdana Kamîran, kartonek jî di dest de bû, bi kaxiza slovanî pêça bû, da destê Kamîran *û* jê re got: Haya te jê hebe dîyarîyeke giran e. Piştî qehwe vexwerin, Kamîran dest avêt wê dîyariyê, xwest bizanibe ew çi ye ta ku carek din; spasiya Bilo bike.

Kamiran, karton vekir, kartonekî din di nav de ye, ew jî vekir yekî din di nav wî de ye, ew jî vekir yekî dinî di nav de, pişti heft kertonan derket meqesek bûdekê (meqesa reza) di nav de ye!

Kamîran li meqesê nihêrî û li Bilo nihêrî, ji Bilo re got: Hey ehmaq! Ma tu nizanî ti rez û baxên min tinene? Ez ê çi bi vê meqesê bikim? Te şîşayeke vodka yan jî wîskî ji me re ji Buligaristanê anîba, a niha me yê bi hev re vexwera.

Bilo: Ma ez jî wek: Te ehmaq im ku carek din ji te re vodka û wîskî yê bînim! Ma ta tu zimanê diya xwe bi vê meqesê nebire, vodka û wîskî di mala te de tê vexwerin?

www.arsivakurdi.org

Hevala bûkê

Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Nave bavê bûkê Abes e hevala bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Xaniyê bavê bûkê paş malan e hevala bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Hespa bavê bûkê kihel e hevala bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevale

Bûk giriya zava keniya hevale bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Destê bûkê hene kin hevale bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Bûkê ter girî kir hevala bûkê gê hevalê
Hevala bûkê gê hevala bûkê gê hevalê

Herem: Hilkeçik (Aksaray-Ekecik)
Berhevkar û rêzker : Memê Hilkeçikî

www.arsivakurdi.org

Îsal temel tam tune bu!

Ayşegul Kisabacak

Wa du sal bûn em necûn iznê, dayik û bavê me êdî qal bûn û me bîra malbata xwe û gundê xwe kiribû, ji bo wê jî me qirar da û em bi arabê xwe di roja tatila kurike xwe em derketinî rê...

Heyam xweş bû, ne pir germ û ne jî sar bû. Rê wekiri bû... Ga di xewê da ga bi sohbeteke xweş û nexweş, ga jî bê deng û bê hers em geştinî gundê xwe.

Me bi coşekî malbata xwe ji qal û pîr heta kurikên biçûk hembêz kir û bi dilşahiye kê destpêka tatîle xwe kir...

Mala xwasî û xenzûrê min nêzikî mala bavê min bû, ji bo wê jî ez pir rehet bûm.

Almancî îsal pir bun. li gund, her roj dengî dolêkê dihat. Di heftê yekemîn da em her roj dicûn sî-çar maleka gund. Di nav wan merlixî ji hebun. Ji cîran û xismên me henek bi yas bun. Em sewê sersaxî dicun. Heneka jî nexweşiyên xwe hebun û lazim bu em wan bibînin. Sedilê Meremî, Memkî Asotma, Elê Hesenê Zewê, Rahmke Muso. Wana îsal ne li nav ortê gund cerx dewun ne jî li ser sokane mala xwe rudiniştin. Êdî li bin erdê bun û beriye wan li ser kaniya mezin, mahle jêre mezedikir... Erê, henek ji wan pir bun, nexweş bun û em bibêjin xelas bun. Ji bin ber destan, lê disa jîi meriv pir pê diêşe... Memkî Asotma hine qem bu di salên min de bu. Em tevhev dicun mektewê û bi cuklixiyê em pir bi hev redilistin.Ji nişkawa miriye. Dibêjin; qelpî wê ra biye.

Rehmke Muso nezikî 60 salî bu, ew ji pir qem bu. Lê ew jî ji uzintiyê mir!.. Fiqarê tu gunek nedî. Mêrikî xwe şofor bu û tim diçu reyên dûr. Mêrik hê 30 salî bu, bi trafik qazasîyê mir. Rehm ji bi sê kurikên xwe ma. Ser kurikên xwe runişt û wan bi xwendan da, lawikekî wê kete nav devrimciya, mektew di niviî da cihişt û kete hepsê. 15 sal danê. Rehm pê pir eşiya û nexweş ket. Paşê keçikek xwe bi yekî tirkî ji Izmirê re zewicî û yad bu cu. Ya xwe ya biçûk jî li ba ma. Husik, ew jî paşê çû Ewrupa û Rehm bi tene ma û perişan bu... Xwadê rehmetiyê bide, jinek pir baş bu.

Me ziyarete sersaxi tamam kir wê carê jî dol derketin. Dol tenê bin, sunnet, nîşan... Ji yekî ra here, yê din ra mere, ew jî nabe, yê suwa bên! Me bi xwe xwe go; em mecbur in li ser kanuna gund stuyê xwe xwar bikin. Me xerclixa îznê gî dan oxuntiyan, erê welle!.. Lê li dolê jî tam tune bu. Em diçun, me mez dikir, ki nîvî merlixiyê tune ye. Ji hev suwa hatine. Sewê ci? Terle, pere, veqetine zewaca...

Sultkê Bekir bi dengkirin bide, tijî îfade ne. Ew ji li gora xwe heqli ye. Diwê; merkî-

www.arsivakurdi.org

min mir kesek ji merlixiyê qapiyê min wene kir, ku hate parvakirina tarla jî gi mina kucika, li ser min civin.

Zaxkê Rawê jî li birayê xwe suwa hatiye, Zaxkê, keçika xwe daye kurê birayê xwe. Paşê jî kurika bi hev ra gecim nekirine. Lawik li Ewropa bu, keçik wi xwe ra bir, sê meha bi şûn da keçike kiriye ucaxê û şandiye bavana...

Mala Huskî Heci jî sewê pera gi li hev suwa hatine. Gund gi qala wan dike. Xwe rezîl kirine. Di nav ortê gund de hingeka mezin kirine. Şorên necê bi hev ra kirine! Ey be, yaw!

Welleh billeh, bi guhdarkirina wan ez îsal nexweş bum. Şekirê min heldikişt, tansiyon mansiyona min govend dikşand, bi qurana ha! Ji destê min jî tişt nedihat. Ga pê diêşiyam, ga pê xûlî dewûm.

Îsal me xwest ku mala xwe hinek tamîr kin. Di nav wan tiştan de jî em bi pakijiyamalê û usta ve mijul bun.

Di nezika dawiya tatilê me de lawkê xwanga min, Soner çu eskerê, tayîna wi Şirnex derket û em bi wê pir tirsiyan. Xwenga min runişt û girî û go: ez lawike xwe dişinim ser! Xudê înşalla, li ruye Sonerê me mezeke û lawkê me sax û salim vegere mala xwe. Me pir temme kir. me go; aman aman, saqin saqin li wê derê qala Kurdistanê, qala Serok merok meke!.. Yê te bi faîlî mecul kin welleh! Ê le, le weng e? Li eskeriya Tirkiyê hertiştek dibe, her roj di xebere da em diwînin.

Wexta ku em li iznê bun, sonuca sinava Universitê ji aciklamiş kirin. Ji gundê me tene 63 gênc qazanmiş kirin. Ji mala me, tenê 4 bun. Lawkê tîyê min, yê gorma min, yê xwenga min. Lawkê birayê min jî pir ügseg puan heyna ODTÜ Mühendislik qazanmiş kir. Yê din jî puanên xwe düşik bun, Acixögretim qazanmiş kirin, ew ji bes e.

Di guna me ra kesî kurkikên xwe xwanda nedidankî.., ku bavê min, ez bişanda ma, welleh min e qe ki nebe, Acixögretim kazanmiş kira.

Îşte, wa izna min a îsal bu... Min pir dixwest, lawkî xwe yî mezin, îsal ji gund bizewcinim, lê me kir wî kir gûca me tê negêşt. Sala tê îşallah, bi xêr...

Zati îsal min ji izne xwe tu tişt fêm nekir, tama gund tune bu!

www.arsivakurdi.org

Nasandina gundê Qişlê

Amadekar: Cengiz Demir û Nurettin Kılıç



Nav: Qişle (Mahmutlu)

Eşîr: Şêxbilan

